

ARMANC  
Xwedî: Yekitiya  
Karkerên  
Demokratên  
Kurdistanê  
★  
Ji mehê carekê  
dertê  
Hejmar : 68  
Çileyê Paşî 1987  
Buha: 10 Skr.  
2,5 DM

# Armanac

SERXWEBÛN • DEMOKRASÎ • SOSYALÎZM

ARMANC  
Issue by  
The Democratic  
Union of  
Kurdish Workers  
★  
Monthly Kurdish  
Magazine  
Nr : 68  
Januar 1987  
Price: 10 SK.  
2,5 DM

Adress : Nordenflychtvägen 20, 112 51, Stockholm, Tel: 08 - 52 87 56 □ Adresa tēkili û naman : P.O. BOX 240 12, 750 24 Uppsala / SWEDEN □ Postgiro : 50 37 99 - 9 □ ISSN 0348-7388

## Cuntayê DÎSK Girt

- Piştî 5 salên mahkemebûnê cuntayê DÎSK girt û 264 kes jî bi cezayên ji salekê heta 15 salan ceza kir.
- Bi vê biryara mahkemê re 28 sendikayên ku girêdayî DÎSK'ê bûn hemû hatin girtin.
- Serokê DÎSK'ê Abdullah Başturk li Brukselê got "ev biryar biryarek siyasiye, piştî ku vegerim Tirkiyê emê îtirazî vê qerarê bikin".



Berpirsiyarên DÎSK'ê di mahkemê de

Piştî 5 salan di 23'ê çileyê pêşîn de mahkema DÎSK'ê qediya û biryar hat dayin. Bi vê biryara mahkema cuntayê 264 kes bi cezayên ji salekê heta 15 salan hatin cezakirin. Di dawa DÎSK'ê de 1477 dihatin mahke-

mekirin. Mudûmûmê urfî îdara Stenbolê ji nav van, ji serok Abdullah Başturk, Sekreterê Giştî Fehmî Işıklar, Kemal Nebîoğlu, Ali Rıza Güven, Mukbil Zirtiloğlu, Tuncer Kocamanoglu û Mustafa Aktopra re cezayê îdamê dixwest; nuha her

yek bi 10 salan ceza bûn.

Mahkemê, biryara girtina DÎSK'ê û cezakirina kesên ku di vê dawê de mahkeme dibûn bi yekitiya dangan girt, endamên mahkemê yek jî li dij vê biryarê derneket.

Dûmahik di rûpelê 7'an de

## Rêxistinên Kurd kuştina O.Palme mahkûm kirin.

- Em dixawazin qedara welat û gelê xwe bi destê xwe tayin bikin...
- Kes nikare ji şerê me re bibêje terorîzm

Di van rojên dawî de hin rojnamên Swêdî yên mezin gelek tişt li ser kuştina O.Palme nivîsandin û her çar jî bi dizî ya bi eşkere di bin xêliya PKK de li dijî gelê Kurd propagandeyek pirr ne xweş dan meşandin. Li ser vê yekê di 28'ê meha 12'an de ji her çar perçên Kurdistanê 16 rêxistinên Kurd beyanek derxistin û propagandên ku li dijî Kurdan tê weşandin mahkûm kirin. Bi kîni di beyana xwe de dibêjin:

"Di ser kuştina Olof Palme re deh meh derbas bû. Lê pirr mixabin hetanî îro qatil, ya jî ên li piştê wî eşkere nebûn. Lê îro li ser vê bûyerê gelek speklasyon tên kirin û navê rêxistînek Kurd jî tê gotin. Ev rewş îtibara têkoşîna gelê Kurd him li Swêd û him jî li cîhanê biçûk dixîne.

Em rêxistinên gelê Kurd ji her çar perçên Kurdistanê carek din diyar dikin ku di kuştina Olof Palme de tu menfeetek gelê me tune. O. Palme, serokekî hêja, humanîstekî mezin, hevalbendekî aşîtiyê nas û her wisa dostekî gelê Kurd î hêja bû. Di nav serokên hukûmet û dewletan de O. Palme ew kes bû ku bi cesaretê piştigiriya gelê Kurd dikir û digot: "Dibê Kurd jî azadî û mafên xwe yê netewî bistîne". Loma jî bi kuştina O. Palme dijmunê gelê Kurd kef kirin û li aliyê din jî gelê Kurd û rêxistinên wî yên welatparêz ji ber wendakirina dostekî xwe yî bi dil û can eşiyar".

Cardin tê gotin ku tevêkirina navê "gelê Kurd" li menfeeta emperyalizmê, CIA, MÎT'ê tê.




"Qatilê O. Palme, ji kîjan miletî dibe bira bibe, bê guman ew aletekî kevneperestiyê û zor dariyê ye û qet bi tu hawî ew nikare gelê xwe temsîl bike.

Em Kurd, îro welatê me perçe bûye û em di bin îşxala û terora çar dewletan de dijîn. Şerê me li dijî emperyalizmê û zordariyê şerê rizgarbûna netewî û azadiyê ye. Û ev şer, şereki biheq e.

Em dixawazin qedara welat û gelê xwe bi destê xwe tayin bikin, ji bindestiyê û paşdemayiyê xelas bin û di nav aşîtiyê de bijîn. Tu kes nikare ji vî şerê me re bibêje terorîzm...".

Radyo, Televîzyon û hemû rojnamên Swêd yên mezin jî bi dur û dirêjî ev nuça weşandin.

## Erdal ÎNONU jî zulma li ser Kurdan qebûl kir



••"Li serhev li çayxanên Diyarbekirê tên gerandin, kesên ku listikekê nelîzin ji wan şik tê kirin û muxbirî polîsa dibin" ••"Di dema îfadegirtinê de lêxistin, ezîyet û îşkence bi firehî dibe".

Serokê SHP'ê E.Înönü piştî ku ji gerra xwe ya Kurdistanê vegeheriya di meclîsê de peyivî; ji teror û zulma dewletê hin mîsal da û axaftina xwe wisa domand:

Dûmahik di rûpelê 7'an de

## BI HÊVIYA SALÊN XWEŞ

□ Me salekê din jî li pey xwe hişt û gava xwe di sivdera deriyê salekê nûh re avêt hundur. Bivê nevē gava salekê tê dawîya jiyana xwe ber bi dîroka de dikişê diçe û salekê nûh di sefera pêşerojê de seri hildide, di serê me herkesî de muhasebek çêdibe. Em encamên serpêhatî, rûdan û tecrubên sala buhurî didin berhev, dipivin, bêjîng dikin, xisar û karê ji hev derdixin û li gor xwe digihîjin qenaetê. Di ronahiya van encaman de, pir hindik hêviyên sala pêşî ber mexuya dibin û bi armanca bidesxistina van hêviyan wek siwarê sala nûh em dest bi sefera xwe dikin.

Gava meriv di serê vê sala nûh de radiweste û berê xwe dide pirêza sala par, xwiya dibe ku sala par ji bo miletê Kurd, ji alîkî de bû salekê gelek dijwar, ji alî din de jî di deftera dîrokê de bi wî awayî hat qeydkirin ku tê de gavên nûh û pêşdeçûnên hêja hebûn. Di jiyayên ku sala par bi xwe re anîn, ji ber sedemên êrişên dijminên gelê Kurdistan, ji ber belengazî, paşdemayîtiyê û xizanî û nezaniya miletê me bûn. Ma ji bindestî û bêazadiyê dijwartir çi heye gelo? U hela gava dijminê meriv ji yê herkesî pirtir, zordartir û bi dek û dolabirbe. U meriv jî li hember vê nezan, bê tifaq û rê û dirb be... Ji rewşek wiha dijwartir, cardin ew bi xwe ye. Lê tevî vê dijwariyê jî, sala par ji bo miletê Kurd bû şahidê hin gavên pêş û rûdanên nûh. Sala 1986 şahidê, têkoşerî, mîxasî û azadperweriya miletê Kurd e, şahidê awirdan û gurrbûna têkoşîna miletê me û pêşdeçûna wî ye. Rawestandina şerê çekdarî yê navxwe, karûbarê hevkarîyê li hember dijmin û di vî riya de avêtina gavên hêja jî, di rûpelê 1986'a de cihêkî şanazyê girtiye.

Helbet gavên ku hatine avêtin, ne bes in. Hê gelek gels (jar) in û yê destpêkê ne. Lê ji xwe her tişt bi destpêkê dest pê dibe.

Loma jî, di gel hezaran dijwariyan ev destpêkê di hêla ku miletê Kurd bi hêviyên mezin û teze têkeve sala nûh, bi manewiyatek mezin dest bi rêwîtiya rîya 1987'a bike.

Daxwaza me ew e ku, hêviyên miletê me bibin rastî, salên xweşiyê vê azadî û jiyaneke şad.

## QAMIŞLO

□ Êrişa cunta faşist bi meşek girseyî hate protesto kirin.

Roja 22.11.1986'an piştî nîvro cendirmên xwînrêj ên Tirk li ser taxa Qudûrbeg a bakurê bajarê Qamişlo gulle barandin. Bi vê gullebaranê re Semîrê Hisko kurê Xidir şehîd ket. Çaxa termê Semîrê Hisko ji bo otopsiyê (muyayenê) birin nexweşxana Qamişloyê bi sedan meriv li ber nexweşxanê civiyan û ev hovîtiya han protesto kirin.

Ji aliyê Tirkan jî ji bo otopsiyê heyetek hat nexweşxanê. Gava ku çavê gel li ber nexweşxanê li heyeta Tirkan û leşkerên wan ê destbixwîn ket, kîni û eşa dilê wan hin jî zêdetir bû. Heyeta Tirk jî ji vî koma gel pirr tirsîya û loma jî ji berpirsiyaran re got ku: "Heya gel neyê belavkirin em nakevin nexweşxanê. Li ser vê daxwaza heyeta Tirk ew gelê ku li ber nexweşxanê civiyan bû bi zor hat belavkirin.

Di dawîya otopsiyê de malbata şehîd, dost û welatperwerên gelê Kurd ra-

## Cunta Tirk hate protesto kirin



Gel darbesta şehîd Kamûran dibine goristanê; bi sedan mirovên welatperwer tevî meşê bûn

kirin şehîdê xwe û bi meşeka girseyî çûn ser gorê. Di meşê de sloganên (şiarên) "Hilweşe cunta fa-

şist", "Bimre zordariya faşîstên Tirk", "Bimre zordariya Evren" hatin

Dûmahik di rûpelê 7'an de

## MA KURDBÛN GUNEHKARÎ YE?

B.S.

Semîr, di nava gel de bi navê Kamûranê Remiko di hate nasîn. Kamûran 23 sal kiribû. Xortekî welatparêz û rençber bû. U ew ji malbateke welatparêz jî bû. Kamûran, bi hin mirovên malbata xwe ve li ber deriyê xwe rûniştibû û xeber didan. Ji nişkê ve bi ser wan de gulle bariyan. Dema ku rabûn bazdan hundir, Kamûran ji çavê xwe birîndar bû û şehîd ket. Lê piştî şehîdbûna Kamûran jî, faşîstan belkî bêtirî sed gulle-yên din jî teqandin. Di navbera mala şehîd Kamûran û "tuxûb" de nêzîkî hezar mîtroiyê heye.

Ji aliyê gelê me ve xwiya ye, ku ev xwînrêjiya faşîstên Tirk ne a yekem û ne jî a dawî ye. Wêkî tête zanîn ku cendirmên Tirkan gelek mirovên Kurd ên bê guneh li nêzîkî "tuxûbe" serxet û binxetê ji ber ku kêfa wan wilo xwestiyê qetîl kirine. Ji bo yî wan, hemû mirovên Kurd armanca tivingê nin. Çi li jêr û çi li jor, ferq nîne. Bi dehê caran me bihîst, an jî dît ku cendirmên Tirkan bê sebeb li ber xetê mirovên Kurd kuştin. Bo çî ev mirov tene kuştin? Yan şivane-

Dûmahik di rûpelê 7'an de

HEVKARIYA YNK—PDK-I

Hêviyên teze...lê bi endîşa barkirî

Di rûpela 6'an de

# Divê meriv zû bi zû tevr û bêra nevirvirîne

Z. XAMO

Çende ki berê kongra Komela Jinên Demokratên Kurdistan çêbû. Ez jî çûbûm wir ku ji xwere li kongrê temaşe bikim. Di pausê de pîrek bi hev re dipeyivîn; li ser wazî- fegirtinê li hev nedikirin. Endamên komîta karger a berê nedixwestin ku carek din tê- kevin komîtê. Û hinekên din jî dixwestin ku ew wek berê wezîfê bigrin. Li ser vê yekê munaqeşe çêdibû.

Bi rastî min jî dixwest ku bi kêmasî hin endamên komîta kevn cardin têkevin komîtê. Lê bê guman wan bi ya dilê min nizanibû, dibê min ya dilê xwe ji wan re bigota. Bi vê nêtê min gotin ji devê yekê girt (Ku min ew nasnedikir): "Xweha min, ma çima tu nakevî Komîta Karger? Vaye pirranî dixwaze ku tu têkeve û baweriya min jî ewe ku dibê tu qebûl bikî..." Lê wê jî li min vegevand û wiha got:

—Welle ez bi xwe nakevî- mê. Tu zanî, çaxa me ev komel ava kir me digot qey wê komelek demokratîk be, û wê tu siyasat nekevê. Lê wer nebû, her kes dixwaze ku siyaset a xwe bîne nav komele. Ez bi xwe baximsiz (serbixwe me) im û viya qebûl nakim. Dibê komele demokratîk be...

Li ser van gotinên jorin min jî re got: "Xweha min, ma çima tu hewqasî jî siyasatê acizî? Ez dibê qey siyasatê ne hewqas tiştêkî pîs e. Li welêt, dujmin siyasat li me yasax dikir, komelên me dida girtin, ne dihiştin ku em, bi

siyasatê mujûl bibin. Û em jî li dij vê yekê derketin, loma jî em hatin kuştin, ketin hefsa û heta ku hatin di vir ve derketin. De icar tu jî dibê bira siyaset nekeve komele. Ya rast, dibê komela we jî li gor komelatiya xwe bi siyasatê re rabe. Dibê em baş bizanibin ku gelê me tucarî bê xebata siyasî xelas nabe..."

Bê guman ev ne cara yeke- mîne ku gotinên wiha tên gotin. Îro li Ewropayê bi heza- ran kesên ku ji partiyên xwe veqetiyane wisa difikirin (Di vir de qesda me pirraniye, bê şik hin kesên serbixwe hene ku wisa nafikirin û di warê tê- koşîna bi rêxistinî û hevkarî- ya bi hêzên siyasî re gelekî pozîtîf in.) Û dîtînen wek ku me li jor qalkiribû diparêzin. Ji xwe wexta ne wiha ba, dibe ku meriv li ser jî ne sekinya. Meriv dikaribû bigota: "Ma çi pêveye, yek ji xwe re wer fikirîye û wer gotiye." Lê em giş jî baş dizanin ku yên wiha difikirin ne "yek û dudu" ne. Cardin tê zaînan ku

Piraniya van kesana li welêt di xebata siyasî de kadroyên ber biçav bûn, berpirsiyar û milîtanên rêxistinên bûn. Partiyên wan û gel, ji wan ge- lek tişt dipan. Lê belê roja cûnta faşîst hukum girt destê xwe û êriş bir ser hemû hêzên siyasî, wê çaxê dijayetiya "ideolojîk" û perçebûnê destpêkir. Bê şik tiştêkî pirr tabî ye ku di demên dijar de însan bêtir ji rêxistinên xwe veqetin. Û jî xwe ne mumkû- ne ku di civakê de her kes

bibe endamê rêxistinê. Em bixwazin nexwazin, hinekê veqetin û hinekê jî tevê bibin. Tu gotinek me jî vê yekê re tune. Bes ya ku em rast na- bînin eve; hinek kes hene ku siyasatê û xebata bi rêxistinî biçûk dibînin û loma jî heta ji wan tê xwe jî siyasatê kef di- kin. Dibêjin bira tu organi- zasyon û komele nekevin bin destê hêzên siyasî. Û ew orga- nîzasyonên ku di bin destê hevalên hin partiyên de ne li gor wan hemû jî ne demoqra- tîk in. Ji bo ku demoqratîk bin dibê di bin destê kesên serbixwe de bin, ya jî bi kê- masî pirranî ji wan be. Li gel viya jî dibêjin ku bira tu partî baweriya xwe ya siyasî di na- va organîzasyon û komelan de belav neke. Lê çaxa cûnta siyasatê li hemû rêxistinên me yasax dike, dibê bira siya- set nekeve nav komelan em li dij derdikevin û van kirinên wan protesto dikin. Îcar li ali- yê din jî em bi xwe dixwazin siyasatê li rêxistinên xwe ya- sax bikin, wek minaka kome- la jina.

Dibê meriv bipirse, gelo ji bo çi ev însanên me ku do xwe ji bo siyasatê didan kuştin lê îro jî hewqasî xwe ji xe- bata bi rêxistinî dîr digirin? Dibe ku di bersîva min de kê- masî û çewtî jî hebe; lê dîtina min ewe: gelekê wan bawer nakin ku van partî û kadroyên mayî bikaribin zora dijmin bibin û Kurdistanê rizgar bi- kin. Gihîştina vê armancê îro jî bo wan xeyal e. Bê guman çaxa bawerî û hevî nemîne her tişt diqede.

Li ser vê meselê çirokek navdar hat bira min. Dibêjin yek hebû li zêra digeriya. He- mû wexta xwe û hişê xwe da- bû vî karî. Di xortaniya xwe

de wer bawer kiribû ku wê ro- jekê muheqaq zêra bibîne, pirr dewlemend û gelekî be- xtiyar bibe. Nig di bin xwe ve- nekiriye; li serê çiya û bani- ya, di nava qîşên asê de û di nav gelî û newalan de wer li zêra geriyaye. Bi vî hawî xor- taniya xwe derbas kiriye; wer westiyaye ku êdî ji pertav de ketiye.

Dibêjin cara dawî cardin li kêleka bestekê li rexê zinare- kî asê destpêkiriye ji xwe re erd kolaye; dîsa mîna hertim li zêra geriyaye. Her roj ji berbanga sibê heta muxruba tarî bê nabên zinar qul kiriye û gome bi ser hev de werge- randine. Roj û meh bi vî hawî derbas bûne. Lê hêdî hêdî bî- na wî teng bûye, tu sebr û te- hamul pê re nemaye. Rojekê qijala nava rojê êdî hew debar kiriye, kêrê daye hestî... Û heta ku deng jê derketiye qîrî- yaye, gotiye:


—Ya meriv bes e, tu çi li berxwe didî?... Zêr tune ye, tune ye, tune ye, tune... Di- bê êdî tu vê rastiyê bizanibî...

Tevr û bêra xwe divirvirîne û dev ji her tiştî berdide, serê xwe hiltîne, dihere. Û bi carê de tobe dike ku êdî hew li zêra bigere...

Yê ev çirok gotiye; dibêje: "Çirok dikaribû li vir biqedî- ya; lê naqede". Dibêje gava wî dev ji karê xwe berda û çû pênc santîm mabû ku bigihîşt- a damarek zêra ya pirr dew- lemend.

Heger sebir bikira û hinekî din jî bikola wê bigihîşt a da- mara zêra û hemû daxwazên dilê xwe bi cih baniya...

Şoreşgerî û rizgarkirina Kurdistanê ji karê li zêra ge- randinê gelekî zahmettir e. Dibê meriv zû bi zû tevr û bê- ra destê xwe ne virvirîne...



Bavê Nazê

## Sersala we pîroz be!

Me rûpelê saleke din, çi bi qencî û çi bi xerabî sipart dîro- kê. Di sala çûyî de, wek her sal, em Kurd di gelek koncal û newalan de werbûn û derbasbûn. Lê di nerîna min de, te- vî ku hîn zewrên weris di hustiyê me de sist nebûne, tevge- ra rizgarîxwaziya Kurdî her bi pêş de diçe û wê here... De ka em di vê baweriyê de bin û sala nuh di dawiya temenê xwe de, wê vê rastiyê pêş meke. Ji ber vê yekê, ezê li ser sala nuh nepeyivim; lewra hîn gelek roj li pêşiya me mane, di wexta wê de, ezê gotina xwe bibêjim. Û niha ez we bi se- rê salê pîroz dikim!..

...

Lê hiç nefikirin, berî ku em têkevin sala nuh, hûnê rojên mayî ji sala kevn bê striyan bi rêkin.

Li gora ku ez dibihîzim, hin xwendevan dibêjin ku stri- yên quncika "Stiriyên me" ko bûne. Dibe ew rast dibêjin. Lê dibe ku çermê laşê wan wilo stûr bûye, heya bi ziqitan- dina xenceran jî nema dihesin loma jî sûc ne sûcê striya ye...

...

Ev yek û ya duduya jî wê li ser xwediyê Îsotê be. Herçî min nedixwest destê xwe di qula kulmozan xînim, lê hîn ji mêj ve gotine, "heger ecclê bizinê tê nanê şivên dixwe!". Ev ne mana xwe ye, ku ez dixwazim girê xwe di Îsotê bi- dim? Na, ez vî tiştî naxwazim, lewra bê îsotê bêvila min di- şewite û diherike... Neyselê de ka ez bê m ser gotina xwe.

Berî çendakî Mamoste ji min pirsî: "Îsota min çawa ye?" Min bi dilekî pak jê re got: "Li gor ez dibînim, xelk ji 'Îsotê' razî ne û di baweriya min de, heger ne zimanê te ba, wê gelekî baş ba!"

Mamoste yek nekir dudu û bi van gotinan îsotek da ber bêvila min: "Heger zimanê 'Îsotê' wek ê te ba, minê ji mêj ve derî lê bigirta!". Bi xwe min nema da pey gotinê.

Di nerîna xwe de min dît ku çiqasî em bi wir de herin, emê hîn bêtir zimanê hev nexweşik bikin... Erê min deng nekir, bi xwe tevî ku ez di wê baweriyê de bûm, ku çewti- yên zimanê "Îsotê" bi qêrîn û hewar xwe didin xuyakirin. Wisa ku meriv kare ji qonaxa navbera erdê û heyvê (ez na- bêjim navbera erdê û rojê) qêrîna wan bibihîze... Ez mam bê deng, min di dilê xwe de got: "Bivê nevê, ew jî qêrîn û hewara şaşiyên min dibihîze û dibe dengê qêrîna wan jî gu- hê wî nahperûk dike"

Bê guman, di vê bûyerê de rastiyek heye. Rastî çiqasî tal be, divê em pê rûnên: Ev rastî jî eve; diyar e herçî em Kurd, tenê şaşitiyên hevalên xwe dibînin û tu carî yên xwe nabinin. Ji bo vê yekê, em di şaşitiyên xwe de digevizin, mexel tîn, bêyî ku haya me ji bayê felekê hebe!

### STIRIYÊN ARMANCÊ DI KÎ DE DIÇIN? -Ji nav nivîsên Bavê Nazê-

A.Rıza ALAN

Ev segbavên zarokan ji Bavê Nazê çi dixwazin? Çima "xwe navêjin hemêza wî" û nabêjin "Apo em jî heval in"? Bira çend sîlan bavêje bin guhên wan, ka xwe davêjin hemêza wî yan na.

Lê nabe, kambaxa Swêdê sîlan rakiriye. Kambaxa, Xopana Swêdê..

Aax ax!..

Ka ew rojên gewr? Ka Burca Belek? Ma ji bavê zorakan ne zêde bû ku xwe navêjin hemêza meriv. Çingîni jî ber guhên wan diçû... Meriv bi destekî radikir guhekî wan û ling metro- kî bilind dibûn.

Erêêê Erê... Bav u kalên me çi gotibûn? "SAL, BI SAL XWEZÎ BI PAR" Ne'wlo?

Henek li wi alî.

Dilê min heye ez van rojan mala xwe bar bikim. Piskilêtek û televizyonek min heye. Her du jî kevn in. Kişandina wan buhatir e.

Gelo Armanc dikare ji kerema xwe re bi awakî wan bigihîne Bavê Nazê?

Belkî dev ji zarokên me berde...

Ez zanim wextê wî tune, ew çend ku êdî rebeno nikare li benda lembar trafikê jî bisekine, lê mi'go belkî wextê hevalekî ji redeksiyona Armancê hebe..

...Ji kerema xwe re piskilêtu televizyona min bi awakî bigi- hîne Bavê Nazê, qet nebe bira ji bo wan neçe Mala Apo, me- riv nizane, dibe ku kurdekî rastî wî were. Lê bi kêmanî, gava yek rastî wî hat jî, divê xwe veneşêre. Çima şerm dike? Tu kurdekî ku neçûbe Mala Apo tune.

Lê, ji mesela por re tu çare nîne. Tu evdê reben nikare təkili- ya teceliya Emrê ilahî bike. Lê dîsa jî, belkî dereceyek bi ser reşayiyê ve ye, û bi kêmanî divê ev jî Bavê Nazê re teseliyek bûna.

Sal bi sal belektir ji par.. Ma Bavê Nazê êdî ji xaliqê por çi dixwaze?

Henek li wê derê, vê carê..

Kamera di sedsala 19'an de îcad bû. Gava ku kamera îcad bû gelek kesan texmîn kir ku wê resamî hêdî hêdî rabe. An wê rola resim kêm bibe. Lê wusa nebû. Ji ber ku ferqa di nav foto- graf û resim de, an ferqa di nav qamera u firçê de, an ferqa di nav xeyal û rastiyê de, an ferqa di nav çêkirin û jiber- cîkirinê de (û her wekî din) ne hindik e. "Hindik" çi ye? Bi qasî çiya ye.

Lê wusa xuya ye ku Bavê Nazê vê ferqê hîn (di sedsala bîs- tan de) nedîtîye.

Di nivîsa xwe ya "Divê meriv wek xwe be" de mamostê xwe dide peyvandin. Mamostê wî temaşa tabloyên huner- mendekî dike. Li wênekî mêze dike, tiştêkî reş dibîne, heva-

### NAMÊN GIHAŞTÎ

- Namên vê dawiyê gihaş- tine me ev in;
- Ji Almanyaya Ferderal; Cot- kar û Belengaz, ji Fransa; M. Amed, ji Uppsala; Ko- mela Kurdistanê li Uppsala, ji Sûriyê (Şam); Dildar, ji Qamişlo; Bavê Stêr, ji Bulgarîstan; Xemgîn Te- mê, ji Kurdistanê Îranê (Nexede); Segvan, ji Îstan- bolê; Şafak Gençlik, Sor- tav, ji Stockholmê; AYRE û ji Kurdistanê Îranê sê na- mên bê nav gihaştine destê me.

### Roja we bi xêr, birayên delal!

Min hejmara kovara we - Ar- manc, sitend. Eva cara yeke- mîne, ku kovara weye xurû kurdî dikeve destê min. Û, bi texmîna min, kurdiya we pa- qîştir bûye, jêhatir e jî. Lê dî- sa ezê çend bir û bawerîên xwe bêjim.

Hûn dinivîsin: "ewî min dît". Ya rast eve: "ewî ez dî- tim"; an jî: "mirina xwe girtî- ye ber çavê xwe". Em dibêjin "mirina xwe daye ber çavê xwe". Gotina "îstasiyon" bi kurdî jî heye: bi soranî dibêjin "êstgeh", bi kurmancî- "hê- vîgeh". Rosta dîsa jî fikra wê

ji sedî sed nade, lê ji 'îstas- ionê' çêtîre. Gotina "kerpiç" jî li ba me heye, dibêjin "agûr".

Eva bir û baweriyên min in û gerek hûn wek rûnê helandî qebûl nekin.

Saxî û pêşketina we daxaza dilê mine.

Birayê we  
**Têmurê Xelil**  
Yêrêvan 2.12.86

### ARMANC A NÛ JI GELÊ KURDISTAN RE PÎROZ BE

Hevalên hêja!  
Ez ji Kurdistanê Tirkîyê xwandê vanekî rojnama Ar- manc im, nuha li bajarekî Tir- kîyê li stenbolê dimînim. Dema ku Armanca nû gihîşt- e destê min ez gelek kêfxweş bûm. Me Armanc bi der û dor a xwe jî da xwendin, kesê ku me bi wan da xwendin tev jî gelek kêfxweş bûn û ji Ar- manc a nû ra pîrozkirinê xwe diyarî kirin.

Xeyrî Armancê, kovarên din jî ji me ra tîn. Kovarên ku dig- hijin destê me, em bi xortên ku ji Kurdistanê hatine Stem- bolê, xwendevan an jî karker in em bi wan didin xwendin. Em bi vî awayî têkilîyên xwe neva dibin û li dii dewleta fa-

şist şerê xwe germ dikin.

Armanc a nû pîrozbe.  
Em hevîdarin ku ewê Armanc jîyanek dîr û dirêj bimeşîne.

Ji sitembolê  
Karkerekî Kurd  
H.Gernas

### DEFÇÎ

- Defçî tu defê bikute  
Ring, ring, ring...  
Ava bibe Adlayî  
Tunebe li cîhanê şerbazi  
Sewî nemînin zarok  
Bira negrîn dayik  
Bi şewt û keser  
Defçî tu defî bikute  
Ring, ring, ring...
- Em avabikin bi tevgerî adlayî  
Em bikşînin bi tevgerî gera dîlanê  
Bira şad û serbixwe bibe cîhana şêrin  
Defçî tu defê bikute  
Ring, ring, ring...
- ★  
Bi tevgerî em bikin gora koledar  
Bi tevgerî em bavêjin tovê azadî  
Bi tevgerî em bêjin sitrana rizgarî  
Bi tevgerî em bimeşin asîmanê hefta  
Bi tevgerî em bikin înternasyonalî  
Bi tevgerî avabikin jîna nû  
Defçî tu defê bikute  
Ring, ring, ring...
- ★  
Ava bibe adlayî  
Bira kes nemîne, tazî  
Bira bê ajotin axa gewrik  
Dest bi dest, tilî bi tilî  
Defçî tu defê bikute  
Ring, ring, ring...

Sernas FARQÎN  
Erzurum



## Rojê 40.000 Zarok Dimrin

Di roja 11'ê çileyê pêşîn sala 1986'an de UNICEF dikeve 40 saliya xwe. Unicef rapora xwe ya 40'emîn weşand.

Unicef, di nav NY (Netewên Yekbûyî) de rêxistinek e û qada xebata vîrîstîne zarok e. Her tiştê ku bi zarokan re têkiliyên xwe hene, di nav xebata Unicef de ne.

Li gor rapora 40'emîn a Unicefê, li dinê rojê 40.000 û di heftêkê de jî 280.000 zarok ji ber nexweşiyên sivik dimrin. Nexweşiyên ku em dibêjin sivik in, îro dermanê wan hene û ku zarok bi van dermanan bîndermankirin (vaccination) wê rê li ber mirinê jî bê girtin. Nexweşiyên wek sorik, birîna reş (TBC), bincûyîn çend ji wan nexweşiyên ne.

Li gor rapora Unicefê serkeftin girêdayî xwendin û nivîsandinê ye. Îro li welatên paşdemayî analfabîzm problemek pir mezin e. Dema xelk nikaribe binivîsîne û bixwîne nikare dermanan jî bi riya rast bikarîne. Ji vî yekê jî îdîa Unicefê ew e ku derzîkirin (vaccination), xwendin û nivîsandin divê bi hev re bête meşandin.



Unicef di vî babetê de gavên girîng avêtîye. Li gor raporê, îro jî do zêdetir zarok tînxilas kirinê. Nêzî 500.000 zarok li dij nexweşîna virîkê (diare) hatine derzîkirin û jî mirinê xilas bûne.

Li gor rapora Unicefê, ne pir demek herê nêzî 40 wela-

tên paşdemayî mecbûr mane ku jî Banka Dinê pere deyn kirine. Dema Banka Dinê perra bi deyn dide van welatan hin şertan jî datîne pêş. Li gor şertê Banka Dinê divê perên deynkirî jî bo avahiyên civakî wek tenduristî, hindekarî û h.w.d. neyên xerc kirin. Ev tê

wê manê ku bi sed hezaran mirîna zarokan ne xema Banka Dinê ye. Banka Dinê bi şertên xwe dixwaze perên xwe bi riya kuştina însanan paşde bistîne.

Kurdî bixwîne  
Bide xwendin

### ŞERÊ ÎRAN Û IRAQÊ

## Ji nuh ve geş bû

□ Iraqê 4 rojan li serhev du bajarên Îranê; Bahtaran û Îslamabad bi topên dîravêj bombardûmankir.

□ Îran bi navê "Kerbala 4" di tenga Delavê Basra de êrişek bir ser Iraqê.



Di dawîya meha çileyê paşî de şerê di navbera Iran û Iraqê jî nuh ve geş bû. Li ser êrişê Iraqê ku 4 roj e serhev du bajarên Îranê: Bahtaran û Îslamabad da ber topa, şer ket qonaxek nuh. Piştî êrişê Iraqê, Îran, roja pêşî 24 seet Basrayê bombarduman kir. Dû re di tenga Delavê êrişek bir ser Îranê. Di van êrişên dawî de dîsa bî hezaran kes mirin û birîndar bûn.

Li gor nûçeyên Îranê; 3.000 leşkerên Iraqê mirine û 6.500 leşker jî birîndar bûne. Li gor nûçeyên Iraqê; êrişê Îranê hati-

ye şikandin û hejmarek zêde leşkerê wan hatiye kuştin û birîndar kirin.

Wisa xuyaye ku şerê navbera Îranê û Iraqê di zemanekî kurt de wê raneweste û hê bi deh hezaran insan wê bîndar kuştin. Gotinên Serokwezîrê Îranê Elî Hamaney wisa dide xuyakirin wê şer hîn xirabtir bibe; "Bi ameliyata "Kerbala 4" me xwest ders bidin Iraqê ji ber mewqîfê wê yê dawî, êrişê eslî û mezin di pêş de wê destpê bike".

## PEYMANA YEKEMÎN JI BO HERÊMÊN JI BOMBA ATOMÎ AZADKIRÎ HATE ÎMZE KIRIN.

Di 15'yê çileyê pêşî sala 1986'an de li payîtexta Fijî, Suwayê protokola peymanê hate îmze kirin. Peymanê konsolôsê Yekîtiya Sovyet ê Avustralayê Jevgeniy Samoteykîn îmze kir û Yekîtiya Sovyet bû yekemîn welat ê ku xwedî bombên atomî ye û peymanek wiha îmze dîke.

Welatên li başûrê Okyanusa Mezin jî mêj ve xebat dikin ku vî herêmê bikin herêmek jî bombên atomî azadkirî. Yekîtiya Sovyet protokolên 2'emîn û 3'emîn ya peymanê Rarotonga (Peyman Li Ser Azadkirina Başûrê Okyanusa Mezin jî Bombên Atomî) îmze kir. Yekîtiya Sovyet bi vî kirina xwe carek din aşîxwaziya xwe nişan da.

### Mahacirên Sowyetê qefle bi qefle paş de vedigerin.

Berî vî ya bi çend salan dora 50 kesî jî Yekîtiya Sowyetê koçî Amerika kiribûn. Lê piştî 6-7 salan poşman bûn û berî serê salê her 50'ê wan jî çûn xwe avêten konsulosxana Sowyet ya New Yorkê û daxwaza paşdevegera welatê xwe kirin. Ev daxwaza wan jî alî berpirsiyarên Sowyet ve hat qebûlkirin û bi balefîrek Sowyet vegeeriyên welatê xwe.

Berê jî du gurûban, di meha çiriya pêşî û çiriya paşî de daxwazek wisa kiribûn û ew jî vegeeriyabûn welatê xwe. Yên vegeeriyên, gişên wan jî gotin: "Em jî jiyana Amerika ne razîne û em nikarin li wê derê bijîn".

Li gor informasyona alîkarê konsolôsê Waşingtonê Aleksî Zvakin yê vegeeriyên pirrê wan Yahûdî ne û gişê wan jî bûbûn hemwelatîyê Amerika.

Kesên ku vegeeriyên gotin; jiyana Amerika roj bi roj ber bi şiddetê dihere û ew jî îstîkbala zarokên xwe ditirsîn.

Baş tê zanin hêzên emperyalîst her roj propagandak ne rast û li ser esasê derewan didin meşandin, Amerika û welatên Rojava wek cinetek ruyê erdê nişan didin. Gelek kesên jî welatên sosyalîst di bin vî propagandayê de dimînin û loma jî welatên xwe dihêlin û diherin xwe davêjin welatêkî Rojava. Lê belê propaganda emperyalîzmê û rastîya jiyane hev û du nagre. Ew kesên diherin Amerika, piştî 6-7 salan dibînin ku pere ji hewa de nabare. Îcar, dikevin rewşên xerab, aqilê xwe berdidin. Û hinekê wan jî revî revî paş de vedigerin welatên xwe.

## Munaqêşe Di Navbera Gelê YS û Gelê DAY

□ Di sala 1987'an de parlamenterên Dewletên Amerika Yekbûyî (DAY) û Yekîtiya Sovyet (YS) wê şerê can bi hev re munaqêşe bikin. Ev munaqêşeyên han wê di televîzyonê her du welatan de bîndar bûn.

Berê jî program li ser jiyana gelên her du welatan hatibû çêkirin û bi weşandina van programan, her du gel jî di derheqê hevûdu de bi kêmasî hinî hin tiştan bûn, hevûdu nas kirin. Nuha jî wê parlamenterên her du welatan werin ba hev û munaqêşe li ser

maf û vatîniyên welatîyên her du sisteman û tewrê insanên her du sisteman li hember civakê bête kirin. Ya din jî wê parastina tebiyê, tenduristî, pirsên mafên insanetî, ewlekariya navnetewî û dê mirov çawa bikaribe şerê atomî bide rawestandî-

nê be.

Biryara van programan di civîna Gorbaçov-Reagan de li Cenevreyê hate standin û van programan wê bi navê "Di Dema Asûmanê de Nêrîna Nû" bîndar bûn.

### MIRÊKA



### CIHANÊ

H. MIZGÎN

## LÎ SER MAFÊ ÎNSANETÎ DU TEWR

38 sal berê roja 10.ê Çileyê Pêşî sala 1948-an de biryar li ser mafên insanetî hat girtin. Ji wê rojê û vir de di komcivînan Netewên Yekbûyî de gelek biryarên din li ser mafên mirovatî hat girtin. Îro giringiya van biryaran di her komcivîna de tê axaftin.

Dem a ku em tîde ne dema atomê ye. Îro li dinê hewqas bombên atomî hene ku bi van bomban dinya me di demek pir kin de dikare wêran bibe. Nêrîna ceribandîna û bikaranîna bomba atomî li dij mafên insanetîyê ye. Ji vî yekê jî di razerînê îro de divê qedexekirin û jî holê rakirina bombên atomî her tim babeta pêşîn be.

Jî alî mafên insanetîyê de niha du baweriyên sereke hene. A yekemîn insan-însanetî-mirovatî û ya duemîn jî dolar-hovîtî-hikumdarî ye.

Dem a M.Gobaçov Hindistanê ziyaret kir, bi Rajiv Gandî re deklarasyonêk îmze kir.

Di vî deklarasyonê de tê beyan kirin ku jiyana insan jî her tiştî bi qiyemettir e. Lê tewrê DAY jî vî baweriyê pir dîr e. Di dewa şerê Vietnamê de leşkerên DAY serê her Vietnamî yekî 2-3 dolar distendin. Ji bo ku leşker bi karîbûna perê xwe bîstanda divîya bû ku laşên Vietnamî şanî qumandarê xwe bidana. "Hê di destpêka sed sala 19'an de Theodor Roosvelt wiha nivîsandibû, "Beşa bi gewet a nijada anglo-sakson divê ji bo beşeriyeta DAY li ser rojavayê dinê hukum bike." (APN) Di kitêbeke din-jî sala 1946-de jî wiha tê gotin; "Sorin û reşikên ku piraniya nifûsa welatên Latîn Amerika jî wan pêk tî, dikarin tenê karên adetî bikin." (APN)

Îro DAY jî bo bawerîya xwe ya dolar hovîtî-hikumdarî li Latîn Amerika alîkariya Kontra, Li Rojhilata Navin alîkariya kevnepereştên Afganî dîke. Ji bo ku kara xwe zêde bike çekan difroşe him Iraqê û him jî Îranê. Ji kirinê DAY xuyaye ku dolar di pêşîya her tiştî de ye. Îro tiştê ku Xaniyê Sipî tîklîhev dîke netîca bawerîya dolar hovîtî-hikumdarî ye.

Yekîtiya Sovyet beyan kir ku pêşniyara afirandina herêmên jî bombên atomî azadkirî, pêşniyarek bi qiyamet e û jî bo pêkanîna herêmên wiha amade ye. Ji zêdeyî salek ceribandina bomba atomî rawestand. Di vî demê de DAY 24 caran bomba atomî ceriband. DAY bi vî jî nema, bi çêkirina teyarên B-1B û stealth ku dikarin fûzeyên atomî yê menzîldirêj bar bikin û bi çêkirina noqarên bi atom dixebitin û mîsîlên Trident-1 û Trident-2 bar dikin, li dij Peymana SALT-2 derket. DAY, bi proja SDI (Şerê Stêrkan) li dij Peymana ABM derket.

DAY, berî ku pêl li peymanan dîke dest bi propagandayê li dij Yekîtiya Sovyet dîke. Yekîtiya Sovyet û welatên sosyalîst bi tiştên derew îtham dîke. Dem a DAY van derewan dîke, 12 mîljon Amerîkî yê bî xanî û bî kar nabîne. Weke ku pisîk di xewna xwe de kezêbê bibîne DAY jî xewna hikumdariya dinê dibîne û jî bo hikumdariyê hov çî jî dest tî dîke.

Gavên ku DAY jî bo dolar-hovîtî-hikumdariyê avêtîye û davêje xeterek mezin e jî bo aşîtiya dinê. Lê belê her roj di quncikekî dinê de xelekên emperyalîzmê diqetin, dewletên ku jî bo insan-însanetî-mirovatî dixebitin, zêde dibûn. Hêzên aşîtiyê roj bi roj bi hêztir dibin.

### SOSYALİZMA REEL

Çekoslovakya:

## Di Otomobîlên Transportê De Pêşketin

Zêdebûna otomobîlizasyonê li Çekoslovakayê bi xwe re parastina tabîyetê jî tîne. Serê vî salê dest bi fîrotina benzîna bê qurşûn yan jî bi navek din benzîna bê dûman hatiye kirin û heta 1987'a hemû otomobîlên bi marka "Şkoda" yê wê vî benzîne bişûxlinin.

Çekoslovakya di nav welatên rûmet û raxbet e. Li alî din jî, îsal di papûrên (riyên) biyanî û di yê Çekoslovakya de wê 49.000 kamyonên nû, 3.300 otobus (bas) û 166.000 motosiklet bişûxulin. Ji ber ku kalîta wan gelek bilind e, di bazarê navnetewî de raxbeta wan jî gelek zêde dibe.

Di nav pîlana 5 salan (1980-1985) de, Çekoslovakya 350.000 otomobîl, 27.000 kamyonên marka "Tatra" û 20.000 kamyonên "Liaz" îxracî derva kir.

**PIRTÛKEK : HABÎTATS NOMATES  
MALÊN KOCERAN  
NIVÎSKAR : DENIS COUCHAUX**

# KONÊ KURDA

• Mehmûd Lewendî •


Lêkolînerê Fransî Dennis Couchaux, bi navê "Habitats Nomates" (Mal/Xaniyên Koçeran) kitêbek nivîsiye. Kitêp sala 1980'yî li Parisê bi Fransî hatiye çapkirin, ji 158 rûpelan pêkhatiye.

Di kitêbê de sê beş hene. Nivîskar piştî pêşgotina xwe, di beşê pêşî de ji destpêkê heta îro qala koçeriyê dike. Di vî beşî de her wiha qala koçerên Kurda jî dike û dibêje "Di roja me ya îroyîn de, li rojhelata Navîn koçerên Kurda hîna jî hene û bi xwedîkirina pez debara xwe dikin û dijîn". Disa di vî beşî de nivîskar çend xerîteyên ku cihê koçeran nîşan dide çêkirîye, tê de cihê koçerên Kurda jî nîşan kirîye.

Di beşê diduyan de bi taybetî behsa kon û xivêtên (çadirên) koçeran dibê. Tê de cihê daye Kurda, Saman (Lapan), Ereb, Belûc, Lurr, Eskîmo, Hindiyên Amarîka, Afrîkî, Latîn Amerîkî û hwd.

Di beşê dawî de jî "Koçerî û Civaka Rojavayî" qala koçerên Ewropa Rojava dike.

Behsa "Konê Kurda" di rûpelê 53. de ye. Me ev beş ji Fransî wergerand Kurdî û em pêşberî xwendevanan dikin.



Wêne : 1 - Konê Kurda

Koçerên çiyayên Kurdistanê tenê babetek konê reş bi kartînin ku îskeleta wê ji sitûnan pêk tê. Gava ku kon vedigrin ev sitûn bi tevayî li gor dûzaneke li pey hev in. Wexta ku mirov li serê banê kon dihişê, serê van sitûnan ku kon hildigrin, wekî komikan xuya dike. Di serê van sitûnan de jî perçeyek potik heye ku di şiklê kumik de hatiye çêkirin. (Van kumikana di eslê xwe de bi kon ve ne, gava ku sitûnan hildidin, serê sitûnan dikeve hundurê van kumikan). Ev kumik jî ji bo wê yekê ne; vexta ku sitûnan hildidin binê kon da ku kon qul nebe, neçire.

Hejmara sitûnan li gor malbata ku di kon de dijî tê guhertin. Ger malbatek mezîn û fireh be, li gor wê hejmara sitûnan jî diguhere, ku wê gavê bêguman

nin ba hev û bi alîkariya qulpiq (hilboqî) û heçyan (çenqalê darîn) —ku bi awakî hostayî hatine çêkirin— van her du qismên kon bi hev ve montaj dikin. (Binêre wêne : 3)

Gava ku kon vedigrin her weha parçe-qumaşekî direj û kêmbêr bi ser her du qismên wê yên ku digihîjin hev ve didirûn. (Li jorî kon di texma serê sitûnên de; binêre wêneyê 2. ciyê îşaretkirî). Ev yek ji bo dilopnekirina kon e, da ku av tê re neyê xwarê.

Disa vexta ku kon vedigrin bi saya werîsên ku ji muyê bizinan hatiye honandin, kon baş vedigrin. Van werîsana bi singên piçûk ve girêdidin û singan jî di erdê de dikutin. Seriyê din ê van werîsan jî li jorê kon bi qulpiqên ku bi kon ve hatiye dirûtin ve girê didin.

Piştî ku kon vedigrin, dora kon jî bi çîtan (çeper) digirin. Van çîtan jî qamiş û zilan çêdikin. Bi benê rîsîn van zil an qamişan wekî ku mirov xalî an geltekê çêke, bi hev ve dihişin, gireddin. Her weha serê çîtan jî

seranser bi potikeke ku ji muyê bizinan hatiye hûnandin, digrin dinexêmin, da ku hem serê çîtan xuya nebe û çîtan neşikên û her weha bi wî potikê çîtan xuya dibê. Bilindahiya van çîtan di nabêna 1 m. û 1.5 m. de ye. Gava ku çîtan li dora kon dikutin (bi çîhdikin) ji bo ku çîtan nekevin sêwanan (singêndirej) li dora wan dikutin, û bi benekî zirav van singan bi çîtan ve girêdidin. Disa, bi alîkariya van çîtan kon dikin sê beş (ger pêwîst be zêdetir jî dikin); beşek aliyê malê, beşek ciyê fera û folan (mitbax-koz) beşê din jî ciyê mêvanan an jî yê rûniştinê ye.

Ger di malbatê de kesên zewicî pir bin, wê wextê li aliyê malê li gor hejmara wan ciyê razanê çêdikin. Ger çîtan tunebe (ku li dora kon heye) wê wextê bi nivîn an jî bi çîwalên tijî ji her kesekî zewicî re beşekî ciyê razanê çêdikin. Bi çîwal an jî bi çîtan sînorên wan datînin.


Wexta hewa sar be, tejekî (parçekonek) din di nabêna kon û çîtan de bi çîhdikin.

## KONÊD EKRADAN


Mela Mehmûdê Bayezidî

"...Konêd Ekradan (Kurda) jî derece derece dibin. Ji du stûnan heta neh stûnan kon hevin. Ji neh stûnan zêdetir kon nabitin. Ê ko gelek jar e, du stûn sê û çar, êd ust (ên di ser re) jî pênc û şeş heft, ê ko axa ne û bi zêde dewlet in konê neh stûnî dibin û ewan konêd neh stûnî çîtan û perde dibin. Yanê yalîkî (alîkî) konê dibirin û perde dikînin û dikin diwanxane ji boy yalî mêran. Ê ewan konan rewaq (rewage) heyin, pêşmal-pêştimal dibêjin, weko tinifêd çadiran in. Weko berf û baran û serma dibitin ewan pêşmal û pêştimalî miwek dikin. Ê di nîva konê de li yalî haremê û li yalî mêran li du cîhan agirî hildikin û kon germ dibitin....  
"...Weko mêvan tete zomeyê (warê kona) ew jî difikirin her çî konê ku mezîn e dajon derê wî konî. Mîvan naçine derêd konêd piçûk. Lewranî ko dizanin ewan yalî mêran tune û bêhal mal in..."

(ji kitêba Adetên Kurdistan, r. 44, ev kitêb di 1858-59'an de hatiye nivîsîn)



Wêne:2- Plana Konê Sereşîreki Kurd (Li hela Muksê)



Wêne:3- Awayê girêdana her du qismên kon

kon jî mezîn e. Di wêneyê 2. de kon 13 m. dirêj e û 8 sitûnan wê hene direjahiya her sitûnekê teqrîben 3 m. ye.

Ev koçer gava konê xwe bardikin, kon dikin du qisim, li piştî ga an jî keran dikin da ku bikaribin bi hêsaniyê di şiverê û riyên piçûk ên çiyayê de biçin. Her kismekî kon beriya ku li piştî ga û keran kin, bi werîsan baş girêdidin. Piştî re her du qismên kon li ser piştî kerê tî-

qezza Basênê yê Ermenî û Kurd, gelekî nêzikî hevûdu bûn. Gelek ji wan, piştî şerê Rus û Tirkîyê yê 1828-29'a reviyane ber bi Rusyayê û beşeke wan sala 1830'î hatine gundê Cercerîsê û Çabanmazê de (niha dikevin nava nehya Anagâsê K.C.) cîwar bûne. Divê bê gotinê, ku vana heta îro jî nala bira bi hevê dijîn, ew ûsa bi Kurdî û Ermenî dipeyîvin ku meriv wan herdu civakan nikare ji hev cuda bike. (39)

Di qezza Motkanê de jî Ermenî û Kurd gelekî nêzikî hev bûn, wek tê gotin hay jî şîn û

şayiyên hev hebûn, rojên buyerên giran li piştî hevdu disekînin. Ya here sereke ewe, ku wextê leşkerê Tirk dihat vê qezayê û dixwest Ermeniya talan bikira, qir bikira, temamiya Kurdên vê qezayê çek hildidan, li hemberî dijimîngê derdikirin. Daniştîwanê qezza Wanê Harûtiyan Turşçiyân niha li Êrivanê, dimîne, dibêje: "Ku bi saya merxasiya Bişarê Seferê Kurd 10 hezar Ermeniyê qezza Motkanê, Vût-Braşênê qirkirina eskerê Tirk xelas bûn. Lê divê bê gotin ku, vê yekê

han qasî ku li qezza Dêrsimê berbiçav diket, li tu qezayên ditir nediket. Ji dîrokê eşkere dibê ku Ermeniya gelek tevger li Dêrsimê çêkirine, rojên giran wan û Kurda alîkarî dane hev û bi destên wan himê kevîrê dostaniyê li wan çiya hatiya danîn. Ev e mîsalkê ku şahidiya wê yeke xweş dike. Grîgor Exoyan vextê qira Ermeniyân, bi destê Kurda xelas bûbû û li çiyayê Dêrsimê bingeh girtibû. Ew dibîne ku gelek çem û kaniyên çiyayê Dêrsimê badilhewa dikirin, li gelf-geboza bela dibin, biryar

Biranînen Generaleki

Tirk



-7- Cemal Madanoğlu  
Wergêr : Alîşêr

Li masa pêşî ya milê çepê, gurûbek serbaz rûdînen. Di nav wan de yekî piçûkek ku jê re Refîk Yuzbaşî dibêjin, gelek caran li ser hev diçe derve û tê. Wexta ku diçe li piştî min dixê:

—Şêr...  
Wexta dizivire tê, disa lê dixê:  
—Şêr, şêr...  
Yek, du, sê û çar...  
Tu dixwazî çî bêjî?  
Cara dawiyê min yuzbaşî girt:  
—Tu dixwazî çî bêjî, yuzbaşiyê min?  
Got:

—Hêrs nebe kurê min, binêre; serbazê ku di şûna min de hatiye tayîn kirin, sê meh tebdilhewa sitandîye. Ez ê niha bimînim li hêviya wî. Bes ku tu yî, wextê te wezîfê girtiye, te gotiye hopp tu hatiye. Tu serbazekî wezîfaperwerî. Kereteyê min rapor girtiye nayê. Êdî bimîne li hêviyê û bisekine... Lama min ji te hiz kir.

—Ê baş e yuzbaşiyê min, tu çima naçî?  
—Ez ê bolukê teslîmê kê bikim? Mirov tune...

—Teslîmê min bike!

Refîk yuzbaşî; pirsî û got:

—Bê şik, ez ê bigrim.

Pê re kursiyekê kîşand ber masa me û rûnişt. Di berîka wî de belgên wî yê teslîmkirîne hazir bûn. Sê nusxe... Ev qas gule, ev qas tiving, ev qas xançer, ev qas çaput, ev qas kinc û filan û bêtan... Lîste li ber min in...

Min her sê nusxe ji îmza kir. Ji wan yek girt, wê bide fermandarê taburê, yek ji li ber min ma. Me herduyan jî belgên xwe xistim ber kêna xwe.

Got:

—A te kîjan boluk e?

—Boluka diduyan...

—Ez niha fermandarê boluka diduyan ê nû me û tu ji fermandarê kevnî: bi kerema xwe tu dikarî niha ji min re çawuşê bolukê bişîni?

—Bê gûman şêrê min...

Yuzbaşî çû şûşekê ereq anî û danî ser masa pêşîya me.

—Ethem, dinêre ka ezê çî bikim?

Çawuş hat:

—Emrê we fermanberê min?

Seet hatiye dehê seve...

—Lawê min, mangek hazir bike, ji yê me re jî bejê! Tiving bi barkirî bila bîn vir. Tu jî bi mangê re were vir.

—Ser seran...

Di ser re niv seet derbaz bû. Fermanberê tivingên makîna hat:

—Ez benî, te min xwestiye...

Carê li fermanberê xwe ên kevin Ethem dinêre û carê jî li min dinêre...

Lîstên Ethem jî di berîka wî de hazir in. Ji min re xwend: Eva hinde tiving û hinde cebirxane, û wd...

—Temam e lawê min?

—Temam e.

Îmze hatin avêtin.

Min wezîfê ji Ethem jî girt.

Boluka diduyan a ku min ji Refîk girt, çawuşê wê jî bi manga xwe ve hazir disekine. Min jî çawuş re got ku:

—Dê tu tivinga makîna biparêzî. Niha dê hûn bi hev re herin Silopiyan. Ev tivinga han dê li Silopiyan bimîn e. Tivinga li Silopiyan bi hêstir û eskerên xwe ve dê bê vir.

—Ser seran...

Ew çûn.

Em jî çûne raketinê.

Odek li qerargeha taburê nîşanî min kirin. Min enzêla (Karyola) xwe a portetîf vekir, xwe direj kir û raket im. Serê sibê zû rabûm. Çawuş hat, tivinga Silopiyan bi gişk tiştên xwe ve hatiye.

—Temam in?

Me hejmart in.

—Belê.

Ez rûniştim. "Takîma tivingên makîne, hatiye dîtin bi çav hatiye lê nihêrtin û teslîm hatiye girtin" bi vî awayî min belge îmza kir û da katip û şande taburê.

Di ser re niv seet derbaz bû an nebû.

Eskerek hat:

Celal yuzbaşî te dixwaze.

Min li deriyê fermanberê taburê xist û ketim hundur.

Celalê yuzbaşî:

—Min emrek tenê da te: min got, dê tu takîma xwe bibînî û bi çavên xwe lê binerî û teslîm bigrî. Tu, hîn do êvarî hatî te takîm teslîm girt. Eva han çava dibê?

Min rewşê jê re qise kir:

—Ez benî, do êvarê, min tivingên li vir teslîm girt û ewan şand Silopiyan û ên li wir da anîn, vê siba han jî min wan teslîm girt. Bi vî awayî, min takîma tivingên makîne dît û bi çavên xwe lê nêrî û bi wî awayî teslîm girt.

Yuzbaşî, li rûyî min dinêriya. Hêviya tiştêkî weha nebû. Sekinî û fikirî:

—Niha tu fermanberê tivingên makîne ye vê taburê yî an na?

(Dom dîke)



Kurdên Basênê diçûn dêrên Ermeniya, dua û pîrozbahî dikirin. G. Hakopyan bi vî awayî dinivîse: "gelek caran wextê Ermenî diçûn ber ziyareta Sûrb Xaçê yan jî Gêxûnê, Kurd jî tevî wan diçûn, qurban didan... (37)

Bi vî awayî daniştwanên Basênê yê Ermenî û Kurd bi hev ve hatibûn girêdan û wekî Hakopyan dibêje: "Kurdek tunebû, ku kirivêkî wî yê Ermenî tunebûna." (38)

Di arşîva Matênadanane de em rastî dokumentekê hatin, ku dide kîvşê, daniştwanên

qezza Basênê yê Ermenî û Kurd, gelekî nêzikî hevûdu bûn. Gelek ji wan, piştî şerê Rus û Tirkîyê yê 1828-29'a reviyane ber bi Rusyayê û beşeke wan sala 1830'î hatine gundê Cercerîsê û Çabanmazê de (niha dikevin nava nehya Anagâsê K.C.) cîwar bûne. Divê bê gotinê, ku vana heta îro jî nala bira bi hevê dijîn, ew ûsa bi Kurdî û Ermenî dipeyîvin ku meriv wan herdu civakan nikare ji hev cuda bike. (39)

Di qezza Motkanê de jî Ermenî û Kurd gelekî nêzikî hev bûn, wek tê gotin hay jî şîn û

şayiyên hev hebûn, rojên buyerên giran li piştî hevdu disekînin. Ya here sereke ewe, ku wextê leşkerê Tirk dihat vê qezayê û dixwest Ermeniya talan bikira, qir bikira, temamiya Kurdên vê qezayê çek hildidan, li hemberî dijimîngê derdikirin. Daniştîwanê qezza Wanê Harûtiyan Turşçiyân niha li Êrivanê, dimîne, dibêje: "Ku bi saya merxasiya Bişarê Seferê Kurd 10 hezar Ermeniyê qezza Motkanê, Vût-Braşênê qirkirina eskerê Tirk xelas bûn. Lê divê bê gotin ku, vê yekê

han qasî ku li qezza Dêrsimê berbiçav diket, li tu qezayên ditir nediket. Ji dîrokê eşkere dibê ku Ermeniya gelek tevger li Dêrsimê çêkirine, rojên giran wan û Kurda alîkarî dane hev û bi destên wan himê kevîrê dostaniyê li wan çiya hatiya danîn. Ev e mîsalkê ku şahidiya wê yeke xweş dike. Grîgor Exoyan vextê qira Ermeniyân, bi destê Kurda xelas bûbû û li çiyayê Dêrsimê bingeh girtibû. Ew dibîne ku gelek çem û kaniyên çiyayê Dêrsimê badilhewa dikirin, li gelf-geboza bela dibin, biryar

-7-

## Hevkariya Civaka Ermeniya û Kurda

KARLANÊ ÇAÇAN

Ermeniyên ji qebîla Mînagiya, hema hema nala hevdu bûn, nunerên wan herdu civakan gelekî rind Ermenî û Kurdî heber didan (41).

Wekî me got, Kurdên Dêrsimê rojên buyerên giran hertim piştî birê xwe yê Ermenî bûn, gîhaştine her êş û tengasiya wan. Her ûsa Ermeniyân jî bi her awayî alîkarî didan Kurda. Em dixwazin meselek alîkariya malhebûnê ya geş a ku rasterast eşkere kirina qenc a wan herdu civakên dest dide kuşê. Di derheqê wê yekê de Ermenîkî ji qezza Çarsengeçê wîha dibêje: "Sala 1919'a em ji Xarbêntê çum gundê Bêriyê, neferê mala

Dumahik di rûpelê 7'an de

## ÇIROK

## Can da lê namûsa xwe ne da

H. Holî

Zarok li nav malên gund palemçe (belva) bûbûn û deriyên dikutan: "Apo, amojin esker hat, xalo, xaltî rabin eskerê reş hatin, dayê, bavo rabin eskerê Romê hatin."

Gund bi carek tevlihev bûbû. Jin, mêr, zarok, pîr hemû weke masiyê bi derman ketibin, ji vê malê derdiketin diketin maleke din. Her kes ji xwe ditirsîya: "Gelo îcar ji bo kê û çi têt?"

Jineke ji ya din dipirsî: —Xwişkê ev doza çi li me dikin? Hîna mehek ne borî ku hatin, bi ser lêdan û nemayiyên ku li me kirin, barxanek çek, pere, berx û heta bi mirîşkan birin û çûn... Hecî Biro û Hesen Keya ji hingê de di nav ciya de ne; xwîn vedirêşin, weke jana zirav li wan hatiye.

Jinika din: —Ê de wele yadê ez jî nizanîm doza çi dikin. Hema tê bîra min, nayê bîra min, çi roja dilê wan bixwaze têt. Rehmetiya dayika min digot. "Hê ji zemanê berê de ye ev esker davêjin ser gunda. Berê wexta ku dihatin; heçî kesên ku ji wan şik dikirin an jî navê wan li cem wan nivîsandibûna dê hemûya bidana hev û bibrana li pişt çiyê gulebaran bikrana û yên mayin jî, ji bo wan çavtirsandî bikin heta ji xwe de biçûna li wan dixistin." Îcar dibêjin, wê çaxê mezinên me doza çêkirina dewletekê dikirin loma evana hewqas çavsofî bûne... ma te ne dît meha borî ku hatibûn çi anîn serê me? Ew çawîşê çavbeq hema dadida ser sosinê û digot "heta bîst rojê eger mêrê te neyê teslim ne be wê çaxê ezê çi bînim serê te tê bibîni. Tirsim vê carê xerabîkê bi Sosina reben bikin.

—Herê welle xwedê meriv bistrîne.

Sê tirinbêlên leşkerî mîna dupîşkên reş bi herwazê gund ve rapelîkîn û hatin li rajorî gund sekinîn. Esker wek di şer de bin tavilê xwe ji tirinbêlan diavêtin û diketin wezyeta êrişê.

Yuzbaşî, çoyek (darek) sitûr di desta de misêwa li kefa destê xwe yê din dixist û bi awirên tûj li hawîrdora gund dinêrî "Ka kesên ji gund direvin hene". Paşê bi tiliya xwe, weke li hewa şiklê çemberekê çêke ji eskeran re îşaret kir û got:

—Dora gund bigrin û ji deh salîya berjor jin, mêr herkesî bicivînin hewşa dibistanê. Zûkin! Dengêkî ecêb û bi xezeb ji qirikê derdiket.

Piştî demeke kurt eskeran ji taxên gund mirovan mîna keriyên pez dabûn pêşiya xwe û dafdidan diannî hewşa dibistanê.

Herkesê, hemû derdên xwe ji bîr kiribûn, wê gavê, wê demê difikirin. Ew

kesên ku ji bo peyvek nebaş an tadeyek biçûk mêra ji hev dikuştin û talana li hev radikirin û qîz û jinên ku ji bo gotinek çewt bi kevira bera mêra didan niha li ber çend eskeran destgîrêdayî û stûxwar mabûn. Lê wan jî dizanibû çerxa felekê bi kîjan alî de difitile, çi bikin îro dewran wiha bû...

Yuzbaşî, berê xwe dabû komiziya millet, çoyê di destê xwe de li ba dikir, kef bi dora devê wî ketibû û diqêriya:

—Hûn hemû wahşî ne. Ker jî ji we çêtir in. Wexta meriv li kera dixê fam dikin ku ji bo zûmesînê ye. Lê ê we, hûn fam nakin, hişê we nayê serê we.

Pantolonê wî yê ku jê dişikîti kişand ser zikê xwe û domand:

—Xelk çûn ser heyvê hûn hîna wekî dewaran dijîn. Îcar karê me tune emê hero diro bi we ve mijûl bibin ha?! Wexta cara borî ku em hatibûn min ji we re negotibû, silehên mayî û mahkûmên xwe bînin teslim bikin. Ka kê ji we anî? Hûn bi lêdanê nabin mirov, divê meriv we hemûyan bikuje, hûn bûne bela serê me.

Bi axaftinê re hemû laşê wî dilerizî. Çavên wî wekî du xarên cîncoq bi çep û rast ve gêr dibûn, ji awirên wî tédigihîşt ku çi dek û dolap di mejiyê wî de disêwirin.

Kistî ji tu kesî nedihat, her kesî serê xwe bera ber xwe debû û di bin çavan re lê dinêrin.

Paşê kaxizek ji berîka xwe derxist û dest bi xwendina navan kir. Heçî kesên ku navên wan dihat xwendin ji nav komiziya millet vediqetiyên û eskeran dirêjî wan dikir; yên hema li wir di bin lêdana daran de bêhiş dixistin, yên dikişandin hundirê dibistanê û yên li tirinbêlan siwar dikirin dibirin dervayî gund...

Hewşa dibistanê ji gundiya re bûbû wek kampa hêşîra. Ji hêlekê de dengê si-xêf û lêdana eskera, ji hêlekê de hewar hewara pîreka û ji hêlekê de kûrîna zaroka -ku ji bo bav an apên xwe digiryan- tevlihev bû, tu hevîya wan tunebû ku kes biçin gazî û hewara wan de. Bes bi bêmeferî digiryan û diqêriyan...

Dema yuzbaşî navê Sosinê jî xwend; gupî bi dilê wê ket, hemû rehên laşê wê sist bûn û hema di ciyê xwe da runişt û girîya "Xwedêyo ev çi sosret bû te anî serê min, evana li ber çavên der û cîrana, wê min rezil bikin."

Çawîş gava çav bi Sosinê ket weka ji berê de hevdu naskiribin di bin simbêla re bişirî, berpê de çû û bêtî ku bihêle Sosinê di ber xwe bide, rahişt milê wê û

li dûv xwe kişand bir hundirê dibistanê

Sosinê xwe di quncikê de melisandinbû kûrîna bû digirîya. Çawîş destên xwe xistibû berîkên xwe li ber wê çik sekinî bû û care-car:

—Tu çima mêrê xwe nayî teslim nakî he? Digot.

—.....

—Ez ji te ra dibêjim, xerber bide!

Sosinê bi kelogirî: —Ma ezê çewa wî bînim teslim bikim, ew mêr e, ez jin im. Tew eva çar meh e nigê wî bi mal neketiye.

Çawîş pehînek li kulîmeka wê da û gotê:

—Nigê wî bi mal neketiye he, wexta tê di himbêza te de radizê xweş e lê jê pê ve tu nizanî.

Sosinê ji fedya û hêrsa dixwest hema di wê gavê de erd biqelişe û ew pê de here. Di jiyana wê de tu kesî gotinên wilo çors jê re nekiribû. Dîsa xwe bi ser hev de guvaşt û weka ku bixwaze xwe ji ber çavê çawîşê li dîr xwe di quncikê de asê kir.

Lê çawîş dev jê bernedida, çav bera Sosinê dabû ku karê xerab pê bike. Vê carê henûn bûbû. Geh qala nebaşiya mêrê wê dikir "Ku mirovekî qatîl û dijminê welêt e" geh digot. "Tu jineke ciwan û xeşik î, heyfa te nîne ku tu hemû jiyana xwe bi wî eşqiyayî re di herimînî, te hew nêrî rojekê yan hat girtin yan hat kuştin. Dev ji wî zalimî berde li kêfa xwe binêre."

Sosinê weke dev û ziman lê lal bûbin di agirê xwe de diqijîlî û kistî jê nedihat.

Çawîş ji bedengiya wê hêrs bûbû; hema rahişt qevda guliyên wê û ber bi xwe de rakir. Sosinê cara pêşî bû li rûya wî dinêrî: Ne wek insanana bû; di serê wî yê qeraxê de reşika çavên wî yê wek ê beqqa di bin bijankan de wînda bûbûn, di firnikên pozê wî yê kemîti de mejiyê wî xwanê dikir, di navbera lêva wî ya dalqandî û diranên zingarî de girêz kom bûbû.

Hêz da xwe ku guliyên xwe ji nav lepên wî derxîne, lê çawîş fersend nedayê bi her du destan wê ber bi xwe ve kişand û himbêz kir.

Edî nedigirîya. Ji bo ku namûsa xwe xelas bike weke mêra di ber xwe dida; her du destên xwe da sînga wî û heta jê dihat bi dawiyê de daf da, çawîş, paşo paşo pengizî û çû li dîwêr sekinî.

Lê vê carê weke ku har bûbe çav lê sor bûbûn, diranên xwe diqirîçand û bi bêhnfîşkî di peyivî, pê re tûk ji devê wî dibariya.

—Ji te tirê tu yê ji destê min xelas bibî ne wer? Niha tê bibîni! got, dest avêt qayîşa xwe vekir û weke ku

Sosinê kewek be ji bo ku wê bigre her du çengên xwe bi kêlek de vekir û ber pê de çû.

Weke ku rihsîn dest xisti-be qirika Sosinê wisa bêhn lê teng bûbû. Ji çavên xwe bawer nedikir. Sosina ku bi salan bû mêrê wê mahkûm û ne li mal bû kesî ne-wêribû awirekî ne baş bidanayê, niha jî çawîş bi eşkerahî û bi zorê doza namûsa wê dikir. "Kuştin ancax vî tiştî safî dikir".

Belê, ji bo ku namûsa xwe neherimîne bi mirinê bûna bi mayinê bûna diviya bû xwe destê wî xelas bikira, lê çewa? Da hişê xwe; "Herê ancax wilo dibû".

Bêhna xwe ji kûr ve veda, hemû hêza xwe da hev, û xwe bi dîwêr ve şidand. Dema çawîş nêzîkî lê kir ji nişka ve ji ciyê xwe piloz bû, pehîna xwe rakir û heta jê dihat li nav rahnên çawîş xist. Kazî ji çawîş çû û bi ser rahnên xwe ve tewiya. Sosinê tavilê li derî xist û bazda derva. Eskerê notir van ê ber derî destê xwe dirêj kirê ku wê bigre, lê bes çarîka wê tenê di destê esker de ma. Lê ew her direviya. Weke kevroska xwe ji nav pençên tajî û segan xelasbike, bê ku li paş xwe binêre, por û fistanê wê li ber bayê ketibûn, li ser taht û latan dipengizî û direviya. Lê bi ku derê ve? Wê jî nizanî bû.

Çawîş, tevî çend eskeran dabûn pê wê, tîfingên xwe lê xweş kiribûn û bi ser de diqêriyan.

—Keçê mereve! Tu gavek din jî biavêjî emê te bikujin!

Lê weke ku deng neçe Sosinê tu pexav li wan nedikir dîsa direviya.

Ji nişka ve xwe li ser geliyê rajêrî gundê kûr û asê dît. Ev gelî jî mîna geliyê Sîpanê Xelatê û çîroka Xecê û Siyabend ji alî bineciyên dorê ve çirok li ser hatibûn gotin. Gelek, kesan ji ber derdê evîniyê an jî ber neçarî û derdên dinê xwe têwerkiribûn. Ev geliyê bêbinî mîna dêwê ku insana daqurtîna heçî kesên ku têwerbibûna xelasiya wan tunebû.

Sosinê li ser çimê geli berê xwe dabû eskera û jî bêçaretîyê mit û mat sekinî bû. Êdî ciyê revê jî nema bû; li alîkî eskerên ku silehên xwe lê xweşkirine da ku bigrin û li alîkî jî geliyê kur.

Ew Sosinê ku bi narîn û bedewiya xwe li nav gund deng dabû, bi şel û vena xwe ji halê pîrekîtiyê derketibû. Bi nigê pêxwas, porê ebolî û awirê çavên ku ji hêrsa xwîn ketibûnê bûbû mîna dîna. Tiliya xwe ber bi çawîş kir û got:

—Heyla rezil ji te tirê tu û eskerên xwe hûn jî mêr

Dûmahîk di rûpela 7 an de

## HINDIK \*\*\*\*\* RINDIK

Yê amade dike: Z. XAMO

## EM JÎ PIRR DERENG MANE

□ Ji Fransayê Konserek Senfonîk a pîrr bi nav deng hatibû Tirkîyê. Serokwezîrê Tirkîyê Turgut Ozal û xanima wî jî hatibûn ezimandin. Çaxa T. Ozal û xanima xwe ketin hundur tew Konsere destpêkiribû jî. Piştî ku li ciyê xwe rûniştin T. Ozal hêdika ji yê kêleka xwe pirsî:

"Ma ev çiyê lêdikeve?"

"Senfoniya nehan."

T. Ozal got: "Hohooo, em jî pîrr dereng mane."

## KÊRÊ DA HESTÎ

□ Êdî kêrê dabû hestiyê Jêhat, bi ser pîreka xwe de qîriya û got: —Heger ku ez peyê vê malê me dibê ji îro û pê ve her tişt bigotina min bibe.

Jinik bi hêrs ji ciyê xwe hol bû û berê xwe pê de kir:

—Te got çi çî, ... hela cardin bibêje!

—Yanî ez dixwazim bêjim ku ji îro û pê ve ezê qerarê bidim, ka ezê berê feraxan bişom, ya jî hundur bimalim.

## MAKANİZMA

□ Piştî derba 12'ê Îlona 1980'î li Kurdistanê gundiyeke ji alî cendirman ve tê girtin. Wî derdixin ber mahkemê. Hakim jê dipirse: "Te yarmetiya şoreşgeran kiriyê."

Gundî dibêje, -belê-

Hakim: Te ew di mala xwe de xwedî kirine.

Gundî dibê, -belê-

Hakim: Te pere daye wan.

Gundî dibê, -belê rast e-

Hakim dibêje: "Ma te nizanibû ev sîc e?"

Gundî: Wê çaxê çawîşê qereqolê jî alikariya wan dikir.

Hakim: Tu li wê çaxê menêre, wê çaxê makanîzma dewletê xera bûbû.

Gundî bersîva hakim dide, dibêje: "Hakim beg, hakim beg, tu dibêjî makanîzma dewletê xera bûbû; ma qey makanîzma min saxlem bû, bi serê bavê te makanîzma min jî xera bûbû."

## EM MAMOSTAN BIZEVICININ

□ Wezîre Malî û gumrukê Kurtcebe Alptemûçîn li navça Bûrsayê li Keleşê bi muxtarên gundan re civnekê çêkiribû. Muxtaran ji Wezîr re gelş û daxwazên xwe rêz dikirin. Hin muxtaran ji wezîr daxwaz kirin ku bira li gundên wan ji bo mamostan hin lojmanên (xaniyên) din ji bîr çêkîrin. Di gotin, "Lojman têra mamostan nakin" Li ser wê daxwazê Wezîr ev bersîv da:

"Em mamostên gund bi hev re bizewicinin. Bi vî hawî emê ji lêkirina lojmanên nuh ji xelas bibin... Bi rastî jî em mamostan bizewicinin"

Muxtarekî got:

—Le mamoste berê zewicî bin?

Wezîr: "Bira xwe ji hev berdan bidin"

Muxtar: "Le wexta her du jî pîrek bin?"

Wezîr: "Bira ji xwe re mîrekî mamoste bibînin"

Muxtar: "Le dema nebînin?"

Li ser vê pîrsa muxtêr bîna wezîr teng bû û got:

—Ê wê çaxê jî bira ji mamostetiye îstîfa bikin."

## DI DÎROKA ME DE EV MEH

- 2 Çileyê Paşî 1919: Kurd Tamim-i Maarîf ve Neşriyat Cemiyeti (Kome-la Berfirehkirina Hîndekarî û Weşanî ya Kurd) hate damezrandin.
- 2 Çileyê Paşî 1919: Mustafa Paşa Yamuqî, Emîn Alî Bedirxan û hin serokên Kurda yê din Komiserê Bîlind ê Îngîlîz ê Îstanbolê ziyaret kirin û li ser esasê prensîbên Wîlson daxwazên Kurda pêşberî wî kirin. Li gor Komîser van daxwazên Kurda bi daxwazên Ermeniya re li hev nedikirin.
- 2 Çileyê Paşî 1938: Jenosîda Dêrsîmê ya duem destpêkir.
- 3 Çileyê Paşî 1980: Milîtanê PPKK Zabît Kaplan ji aliye Apoian ve li Çermûgê hat kuştin.
- 5 Çileyê Paşî 1985: Zîmanzanê Kurd Tewfîq Wehbî li Londrayê çû heqîya xwe.
- 6 Çileyê Paşî 1971: Şubeya DDKO li Diyarbekir hate damezrandin.
- 8 Çileyê Paşî 1960: Dadgeha 49' a destpêkir.
- 9 Çileyê Paşî 1960: PDK-I programa xwe pêşkêşî Abdulkerim Qasim kir.
- 10 Çileyê Paşî 1946: Organa PDK-Î, rojnama Kurdistan li Mahabadê dest bi weşanê kir.
- 10 Çileyê Paşî 1971: DDKO li Hezo (Kozluk) yê mîfîngêk pêkanî.
- 11 Çileyê Paşî 1977: Endamê DDKD û hevalê PPKK Ahmet Söken ji aliye faşîstan ve li Erzeromê hat şehîdkirin.
- 13 Çileyê Paşî 1946: Li Mahabadê Cumhuriyeta Demokratîk a Kurdistan hate damezrandin.
- 18 Çileyê Paşî 1971: Şubeya DDKO li Batmanê hate damezrandin.
- 22 Çileyê Paşî 1946: Qadî Mihemed ji bo Serokatiya Cumhuriyeta Demokratîk a Kurdistanê hat hilbijartin.
- 23 Çileyê Paşî 1932: Ji ber xeteriya Serîhildana Agiriyê dewleta Tirk û Îran bi hev re rûniştin, bi peymanekê jî nû ve hidûdê xwe ji hev veqetandin.
- 24 Çileyê Paşî 1971: DDKO li Batmanê mîfîngêk pêkanî.
- 30 Çileyê Paşî 1919: Di Konferansa Parisê de bîyara Kurdistanek serbixwe dertê.
- 31 Çileyê Paşî 1919: Kovara Kurdistan li Îstanbolê dest bi weşanê kir. Çileyê Paşî 1920: Meclîsa Osmanî, belge Mîsakî Millî qebûl kir. Di vê wêsiqê de perçêkî mezin ji Kurdistanê di nav sînorê dewletê de dihat hesibandin.
- Çileyê Paşî 1980: Endam yek ji berpirsiyarên herêma Bîngolê yê PPKK Abûqat Şakir Elçî ji alî faşîstan ve li Bîngolê hat şehîdkirin.
- Çileyê Paşî 1982: Endamê DDKD Önder Demirok di hêsa Diyarbekir de ji aliye mîfîngêkarên ve bi îşkencê hat kuştin.
- Çileyê Paşî 1984: Di girtîgeha leşkerî ya Diyarbekir de daxuyanîyek mezin çêbû. Girtî ketin rojîya mirinê. Di vê berxwedanê de têkoşerên Kurd Necmettin Büyükkaya, Mehmet Kaya, Ahmet Toptaş, Ahmet Bayik, Remzi Aytürk, Kenan Ergül, Yılmaz Demir û Halit Çatak şehîd ketin.

# Biratiya gur û rovî

□ Di van rojên buhurî de Partiya Îslamî ya Afganistan bi îmza reisê partiye; Gülbeddin Hikmetyar namek ji berpirsiyarê Munihê yê partiye Kerîm Muhacîrzade re şand. Nuxsake vê nameyê ket destê me.

Name bi "Bismillahirrahmanirrahim" dest pê dike. Piştî silav, serxweşî û duaya name bi tevayî ev e;

"Birayên min ê fedekar! Wekî me berê di derheq birayên xwe yên tirk ku li Almanya dijîn biryar girtibû li gor vê biryarê divê em têkiliyên di navbera me da hene fireh, bi hêz bikin. Ji hebûna wan a li wê derê bi şikleki azamî feydê dîtin wezîfeyek muhîm e. Û ev yek ji bo we û cihada me yê mubarek pîrr muhîme û di nav xebata girîngtirîn e û berpirsiyarek bilind e.

"Wezîfa berpirsiyarên me yên partiye yên Munihê belavkirina nêrin û armancên



me di nav Tirkên ku li Almanya dijîn, bihêzkirina partiye ye divê em hin bêtir

sazûmanên resmî yên Alman û rêxistinên din ên humanist bikşînin ser partiye

û ji bona vê yekê ji bi şikleki muwaqet bikaranîna hin riya diplomatîk wezîfa we ye. Piştî ku em gihîştin armancên xwe û me planên xwe bi cih anîn, li dijî wan (Tirkan N.M.) laqaid bimînin û hetta em kar bikin ku riya berpirsiyarên rêxistinên li dijî wan, wan reşbîkin, zeif û piçûk bixînin. Di dema vê xebatê de divê em sîrrên partiye yên bi ehemiyet ji wan re nebêjin".

Di vir de qet çewtiyek an jî xususek întesant tune. Mesele pîrr vekirî ye:

Baş tê zanin ku kevneperestên Afganî alikariyê ji emperyalîzmê û Tirkîyê digrin ji bo ku li dijî hukûmeta Afganistan şer bikin. Îcar bê guman çaxa vê alikariyê digrin hesabê menfeetên patron û şefên xwe jî dikin. Loma jî xuya ye hevaltîya wan, hevaltîya gur û rûvî ye.

## Dawa DDKAD'ê di çapemeniya Swêdî de

Xebera biryara Mehkema Leşkerî ya Dîyarbekir a li ser cezakarîna endam û berpirsiyarên DDKAD'ê (Komalên Jinên Demokratên Şoreşger), di rojname ajans û radyo û televîzyonên Swêdî de gelek cih girtin.

Televîzyona Swêdî, di 9'ê meha 12'a de bi kurtî got ku "ji bo ku di 1978'a de cejna jinan a 8'ê Adarê pîroz kirin, 6 jinên Kurd, her yekê 8 sal ceza xwarin". Her di vê rojê de, vê xebera han ji bal radyoyên merkezî û herêmî gelek caran hat weşandin.

Rojnamên roja 9 û 10'ê Çilê Pêşî ji bi frehî cih dan xebere cezakarîna jinên Kurd. Rojname mezintirîn a Swêd a êvarî "Aftonbladet" bi manşeta "Ji berpîrozkirina Cêjna Jinan Ceza Xwarin" xebere da. Rojname rojê "Dagens Nyheter" jî nivîsand ku "Mehkema Leşkerî ya Tirk Kurdên Cezakir" û bu firehî cih da xebere. Ajansa Swêdî ya bi navê "TT" rojêkê pê de xebere weşand. Rojname heremî "Uppsala Nya Tidningen" jî bi manşeta "Nuha 8 sal Ceza girt" cih da xebere.



### RADYOYA ALMANYA FEDERAL: Li ser Kurda programek weşand

Di roja 13.12.1986'a de radyoya Almanya Federal li ser Kurda bi navê "Agirê Venemirî" programek weşand. Di programê de tiyatroya radyoyê Newroz û agahdarî li ser dîrok, ziman û çand gelê Kurd hebû. Program seet û nîvekê ajot. Ev cara pêşî ye ku, radyoyek Almanî wiha dirêj û fireh li ser gelê Kurd programekê diweşîne. Koroya KKDK ku ji aliyê Huseyin Erdem û Sumerya Çakir ve hatibû amadekirin bû alîkarê muzîka programê.

Ev program piştî xebatek dîr û dirêj ji aliyê welatparêzên Kurd Huseyin Erdem û pîreka wî Emîne Erdem ve hat amadekirin.

Program him ji alî hunermendî û him jî ji aliyê naveroka xwe ya zengin gelek bala guhdarên Kurd û Alman kişand. Û nuha Kurd û dostê wan ê Alman ji radyoya WDR 3 dixwazin ku ev program di Newrozê de carek din bê weşandin. Divê her Kurdê welatparêz çî bi telefon û çî bi riya nama be ew jî vê daxwaza han ji radyoyê bikin.

### Li ser erdên Tirkîyê û Kurdistana Tirkîyê 240 fuzên nukleer hene

Li gor salnama "Mêzîna leşkerî 1985-1986" a çekên ku bi guleyên nukleer barkirî ne, ev in:

- Honest John: Fuza menzîl kurt a balîstîk. Menzîla wê 38 km. bi seriyekî 20 ya 40 kilotonî hatiye barkirin (18 heb)
- M-11: Fuza havan a 203 mîlîmetrî. Menzîla wê 16,8 km. seriyên heta 10 kilotona dikşîne (48 heb)
- M-109: Fuza havan a 115 mîlîmetrî. Menzîla wê 18 km. bi seriyek kilotonekê barkiriye (72 heb)
- Nike Hercules: Fuza ji erdê bi hewa ji hewa bîn bi erdê. Menzîla wê 140 km. Bi seriyên 20 ya 40 kilotonî hatine barkirin. (72 heb)

Teyarên ku bi seriyên nukleer barkirî ne ev in:

- F 104 G/S: Menzîla wê 2400 km seriyên heta 20 kilotona kare hilgire (97 heb)
- F-4 E/F: Menzîla wê 2200 km. seriyên heta 1,1 megatonê kare hilgire. (60 heb)

## FERHENG Dimilkî - Tirkî [Zazaca - Türkçe] SÖZLÜK

Di dîroka Kurdistanê de cara yekemîn e ku ferhengêk bi zaravê dimilkî bi awakî rêk û pêk, bi frehî dertê. Şîrovekirin û manên peyvan bi tirkî ne.

Ferheng ji bal zimanas û nivîskarê Kurd Malmîsanîj, piştî xebatek dîr û direj a salan hatiye amadekirin.

Ferhenga Dimilkî - Tirkî di vê mehê (Çilê Paşî 1987) de ji bal weşanên Jîna Nû tê çapkirin. Temamê wê 431 rûpel e.

Buhayê wê li Skandinaviya 100 kronê Swêdî ye. Ji bo Almanya û welatên din ên Ewropa mesrefa postê jî tê de 35 DM ye.

Yên ku dixwazin karin perê buhayê wê bişînin ser hesabê (Postgiro: 50 37 99-9/Sweden) û ji navnîşana jêrîn bixwaze.

Navnîşan: Jîna Nû Förlaget

Post Box 240 12 • 750 24 Uppsala-SWEDEN

# HEVKARIYA YNK—PDK-I Hêviyên teze... Lê bi endîşa barkirî

Meha Çirîya Paşî ya derbasbûyî (7-8'ê Çirîya Paşî) gava guftûgoyên navbera PDK-I (Partî Demokratî Kurdîstanî Iraq) û YNK (Yekîti Nîştîmanîy Kurdistan) bi biryara ku herdu aliyên siyasî hêzên xwe li dijî rejîma Saddam bighînin hev gihâşt encamekê, vê yekê bi awakî mezin bala gelê Kurdistan kişand û hêviyên wî rakir pedarê.

Ev herdu hêzên siyasî, bûbûn unsurên esasî yên çavkaniya dijayetiya navxwe, şer û perçebûna ku bi salan e bûbûn yek ji karakterên esasî yên tevgera rizgarîxwaziya milî ya Kurdistana Iraqê. Ma gelo wê çewa, hêvî ranekirana pedarê gava hat beyan kirin ku ev herdu unsurên esasî nihayet hatine cem hev, û biryar girtine ku dawî li şerê nev xwe yê xwînawî bînin û hêzên xwe li dijî rejîmê xwînêrê Iraqî bikin yek. Yê di şerê çekdarî yê navxweyî yê di navbera muxalefeta Iraqê (ku di bingehê wê de dijayetiya van herduyan hebû) de hatin kuştin, hema hema ji hejmarayên di şerê dijî rejîm de jiyana xwe dan, pirtir bûn. Li alî din dijayetî û nakokiyên ku di qonaxa şerê çekdarî de dom dikir, rê li ber hevkarîya mixalefeta dijî rejîm girt, nedihîşt têkoşîn bi hemû hêza xwe berê xwe bide rejîm, bala raya giştî ya hundur û derva ji hov û harîtiya rejîm bi dîr dixist û dida bal bi nakokiyên navxwe. Her ji ber vê sedemê ji wî potensiyelê jî texrîbata 6 salê şerê Îran û Iraqê nerazî û dijî rejîm, nikaribû bihata kanalizekirina nav refên têkoşîna aktîf. Loma jî hêza têkoşîna çekdarî di bin reddeyekê da dima. Bi deh hezeran mirov, her çiqas dixwestin ji hovîtiya rejîm û şerê Îran û Iraqê birevin jî, wê baweriyê di xwe de nedidîtin ku bîn, têkevin nav sefên hêzên muxalîf. Vê rewşa han ji alîkî de, bi taybetî tevgera rizgarîxwaziya Kurdistana Iraqê, bi tevayî jî têkoşîna dijî emperyalî ya ji bo demokrasî û azadiyê zeif dikir, ji alî din de jî, rê dida ku rejîm bihna xwe vede.

Loma jî gava di meha Çirîya Paşî de, beyanên resmî diyarkirin ku YNK û PDK-I biryar dane şerê navbera xwe rawestînin û hêzên xwe bikin yek, ji nişka ve hêviyên teze rûdan li ser esasê ihtimala vebûna riya rakirina kêmasî û nebaşiyên ciddî ku heta nuha di nav têkoşînê de bûn. A di esasî de yê ku bû çavkaniya balkêşiya mezin a gelê Kurdistanê, ev hêviyên han bûn.

Gelo Hêvî Wê Bibin Rastî

Helbet, îro ji bo gel, her tişt di qonaxa hêviyên teze de ye. Meriv nikare bêje her ev hêvî bi endîşan jî ne bi barkirî ne. Çewa geleki tebîîye, miletekî ku bi salan e bi hesret û bêriya gihâştina xelasî û azadiyê xwîna xwe texprî nekiriye; ev millet çewa gava di nav xwe de rûdanek baş a hûrik jî bivîne bi hêviyek mezin berê xwe didiyê, her wiha gelek tebiî ye, hêviyên miletekî ku gelek caran pêrgîyî (tûşî) rûdanên tûj û tal ên sedemên biserneketina buye, bi endîşan barkirî bin.

Gelo sedemên ku hêviyên teze bi endîşan bi bar dikin çî ne? Berî her tiştî divê neyê jî bir kirin ku biryara "yekkirina hêzan" piştî wî şerê navxwe yê salan tê ku vî şerê rê daye derketina gelek problemên dijwar ên ku di tarîxê de şop hiştine. Gelo ev "tifaq" wê di jiyane de bimeşe û nakokiyên dîrokî (qe ne be ew nokokiyên ku rê li ber yekîtiya hêzan digrin) jî holê rake, yan wê bi navê tifaqek ku li ser kaxez maye têkeve dîroke?

Li alîkî din, armanç û çarçeva hevkarîya navbera her du hêzan di çî sewiye de ye, li ser Kîjan nuxtên prensîbî wê avabibe. Ev tişt, yek jî ji bal raya giştî ve nayên zanîn. Raya giştî ji mesela ku meha Çirîya Paşî her du hêz bûne yek pêştir tu tişt zêde nizanê. Gelo hevkarî wê hevkarîyek miweqet a eskerî be, yan wê li ser avayiyek ku armanç program û çarçeva wê xuya, bi kerekterê xwe demokratîk û milî, bê avakirin? Wê hevkarî hêz û partiye din ên Kurd ên pêşverû jî bigre nav xwe, yan wê bi hebûna her du hêzan bê sînor kirin? Heke, meylek wê ya berfirehbûnê tune ye, sedem çî ne? Her wiha di vê çarçevê de, mewqîf û peywendiyên wê bi mixalefeta Iraqê ya Ereb re; bi PKI (Partiya Komînist a Iraqê) û bi hêz û partiye welatparêz û pêşverû yên Ereb ên din re wê çawa be?

Yê ku dibê sedemê endîşan yek jê jî ewe ku gelo wê mewqîfê wê hevkarîyê li hember şerê navbera Îran û Iraqê û bi taybetî jî, li hember rûdanên ku bi xelasbûna şerê wê pêşde werin wê bibê çî. Wê peywendiyên wê û karbidestiya (îdara) Îranê ya dîni li ser çî naverokê û di kîjan derecê de bîn avakirin. Bêguman, peywendiyên karbidestiya Îranî yên ku bi tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê re danîne, di çarçeva taktîkî de ne û li gor hesabê şerê bi Iraqê re hatine avakirin. Helbet meriv nikare bêje ku berpirsiyarên YNK û PDK-I hay jî vê rastiyê nînin. Lê di mesela gavên ku dikevinê de, û di mesela ku, di mesela çêbûna guhastina di taktîkên Îranê de ku sibê hesab wek îro dernekeve wê çî biqewime? Wê çawa karibin ku, tiştê qewimî nikaribe zirarê biide tevoera rizaa-

rixwaziya Kurdistanê?

Gelo berpirsiyar bi dîr û dirêj li ser bersîva van pirsan rawestiyane yan na, gelo li hember rûdanên muhtemel, tedbîrên lazîm rast hatine tespîtkirin an na? Vê yeka han ji bal raya giştî naye zanîn. Heke *bêagahdarî* tînik serpehatiyên tûj û tal ên borî (1975) û dibin sedemê endîşa her hêz an kesekî welatparêz ê Kurdistanî, ev tiştêkî tebiî ye, heq e.

Lê divê em tiştêkî ji ber bala xwe bi dîr nexin; endîşên ku ji ber mesela vê nuqta dawî tînik, ger biguhere bibe endîşa li ser hevkarîya her du hêzan, dibê xwexapandinek mezin. Ger li ser nuqta dawî endîşe hebin jî (ku gelek caran di çapemeniya Kurd û her wiha di rûpelên Pêşengê de jî van endîşan cih girtine) divê ne di "tifaq" nûçebûyî de bin. Endîşe berî wê û bêyî wê hene. Hetta "tifaqek" wiha, kêmasî û xirabiyên sedemên endîşa xurt nakin, bileks zeif dikin. Heke bi rola xwe rabe ev tifaq, di vê riya de jî kare bibe gawe dîrokî. Ew jî bi şerte-kî: ku liser esasê milî û demokratîk, bi program û armançên siyasî yên eşkere û bi berfirehî ya ku hêzên muxalîf ên din jî bigre navxwe, bê avakirin.

Gelo wê hêviyên teze yan endîşe bin rastî? Bersîva vê yekê, di qonaxa pêşîya me de gava hêzên welatparêz ên Kurdistanê û bi taybetî jî PDK-I û YNK bersîva ku me di vê nivîsê de pirsîne dan, wê eşkere bibe.

Ji Pêşengê  
Organa Komîta Merkezî ya PPKK  
Hejmar: 49  
(15 Çilê Pêşî 1986)

## BI KURTÎ

□ Televîzyona Swêdê kanala 2'a roja 16.12.1986'a nîv seet li ser rewşa Kurdistana Îranê programek weşand. Rojnamevanê Swêdî Bo Holmqvist û fotokêş Nicolò Majstrovic meheke bi pêşmergan re li Kurdistana Îranê geriyane.

□ Program li ser rewşa pêşmerge û jiyana dijwar a gele Kurd di-sekinî.

□ Roja 14.12.1986'a Kongra Komela Çandîya Kurd li Nacka û rojên 20-21.12.1986'a Komela Kurdistanê Li Uppsala kongrên xwe civandin.

□ Roja 13.12.1986 Komela Çanda Kurd Li Botkyrk şevê çêkir. Di şevê de êkîben folkloro Kurdî û dengbej Brîndar, Rêzan, F.Teyra û ekîba muzîkê a Şîîyê beşdarbûn.

Despêk di rûpelê 1'ê de

**Cuntayê DISK girt...**

Piştê vî biryarê bi hawakî resmî him DİSK û him jî 28 sendikayên giredayî wê hatin girtin. Mahkema cuntayê bi vî biryara xwe carek din jî nişan da ku ev hukûmet bi her hawî li dijî çîna karker û hemû rêxistinên wê ye.

Li aliyê din biryar (qerar), ji alî gelek kes û rêxistinên navnetewî ve hat protestokirin. ICFTU (Konfederasyona Sendikayên Karkerên Hur ên Navnetewî) "Em bi şidet vî biryarê protesto dikin. Em ji Mahkema Leşkerî ya Bilind û ji hukûmeta Tirkîyê dixwazin ku vî biryarê ji nuh ve bigrin destên xwe".

CGIL (Konfederasyona Sendikayên Karkerên Îtalî) "Di wextek ku Sahara tê berdan, li gel hemû hereketên girin li Rojhilata Navîn, li welatekî mensûbê Ewropayê paşdeçûnek wisa bi rastî mirov pê li berdikeve"

ERCUMENT TAHİROGLU (Abuqatê DİSK'ê) "Bingehê vî biryarê ya huqûqî tune ye. Bi vî biryarê, nikare bê gotin ku DİSK hate girtin. Biryar siyasî ye"

ABDULLAH BAŞTURK (Serokê DİSK'ê) "wek min berê jî gotibû, biryar siyasî ye. Heger girtina DİSK'ê bê qebûlîkirin, wê çîna karker DİSK'ên nuh ava bikin."

METİN TİRYAKİOĞLU (Serokê Sendîqa BASİSEN) "Yen ku îro hukûm di destê wan de ne, dibê vî baş bizanibin ku bi kirinên ne demokratîk rêxistin dikarin bîne girtin. Lê belê tu kes nikare zincîra li bîr û baweriyên azad xe. Heger yek bê girtin wê deh heb jî ji nuh ve derkevin".

**Erdal İnönü...**

despêk di rûpelê 1'ê de

"...Milet ji muamele, zulm û zora dewletê pîrr gazîna dike. Girtin, taqibat muamelen ne insanî dom dikin. ... Bi baweriyên min, ew rewşek pîrr wahîme. Mesela, li Diyarbekir li serhev li çayxanan tîn gerandin, ji merivên ku listikê nalzîn şik tê kirin û muxbîriya van kesan ji polîsan re tê kirin. Di dema îfadegirtinê de lêxistin, ezîyet û îşkence bi firehî dibê."

Li nehya Sêrtê Dargeçîtê (Kerboran) pîrekên hîn kesên ku li wan tîn gerandin hatine muayenekirin ji bo ku bizanibin ka bi peyên xwe re razane ya na. Mesela muhafîzên gundan jî gihîştîye qonaxek pîrr bi tahlûke. Bi pîjîkirina muhafîzên gundan gelek dîjmanîyên eşîrî gurrur bûye. Ew kesên ku ji dewletê sîleh girtine li ser şikê be jî selehîyeta wan heye ku berra insanî din û bi vî hawî ketine qetla gelek kesên bê guneh..."

**Cunta Tirk Hate...**

avêtin. Û van sloganana li ser tacegulan jî hatibûn nivîsandin.

Piştî gorkirina şehîd Semîrê Hisko, li ber mala bavê wî konekî reş hat vegirtin. Ev çend roj in ku bi hezaran Kurd diçin serxweşiyê. Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan, KUK-SE û Partiya Demokrat a Gelê Kurdistan jî bi hev re çûn serxweşiyê û li ser navê her sê tevgeran hevalekî wan peyivî; bi kurtayî wisa got: "...şehîdê me tevayê, êşê me tevayê. Dawî anîna kuştina Kurda bi rizgarbûna Kurdistanê ve girêdayîye..."

Muxabîrê Armanç Qamişlo

**Ma Kurdbûn...**

ke pezê xwe diçêrine, yan keçikeye-jîneke li nav pîrêzê

metkêşe li nav werzê (bistanê) xwe tevrik dike û yan jî xortekî nuh gihayî ji gulleya xayin bê xeber li ber derê mala xwe rûniştîye. Ma ne bê guman xwiya ye ku tevê van jî bê gunehin. Lê yek gunehê wanî ku ji aliyê dijmin ve qet û qet nayê efûkirin heye: Ew jî Kurdbûna wan e! Emê şehîdên xwe ji bir nekin.

Lê bila Kenan Efendî jî, dûmahîka hevalbendên xwe Şah, Somoza û Markos ji bîr neke...

Qamişlo

**Stiriyên Armançê...**

lê kêlaka wî jê dipirse: "ma ew ne wek insanekî ye?" Li ser vî yekê mamostê Bavê Nazê weha dibêje:

"Gelo çima em ê li reşîkê insan bigerin? Çima ew ê ne bi gewd û qelafetê xwe li ber me be? Daku em spehîbûn û mekruhûbûna wî bibînin... Divê hunermend rastiyê çî tal û çî şêrîn pêşmeke"

Û îcar Bavê Nazê dibêje: "(...) çî di hunermendiyê de û çî di jîyanê de, divê insan di krasê xwe de rûnê. Erê pêwîst e ew di kirasê xwe de be, (...) tenê hînga em ê li ber karekterên ku ji xurîstê (1) û jîyanê hatine hunandin, bin. Ma jê bedewtir?"

Belê, resim an tablo, an bi gotina Bavê Nazê "xaliçe", ne fotografên tebiîtên an jîyanê ne. Lê tefsîra wan in. Ji xwe jî navê jî xuya ye, em di kurmançî de dibêjin "fotograf kişandin", lê "resim çêkirin."

Yanî ji hunermendekî tu carî nayê xwestin ku ew di eserên xwe de insanekî an berazekî an tiştekî din bi "gewde û qelafetê xwe ve" û "wekî ku di jîyanê de an di tebiîtê de" heye şanî me bide.

Ev, berê, di sedsalên buhurî de, dihat xwestin. Lê ne îro. Hinek amator îro jî wusa dikin. Lê ne hunermend.

Em bêjin tirimbêla Bavê Nazê tune, televizyona wî tune, videoya wî û piskilêta wî tune. Em bêjin Bavê Nazê pê nîzane ku li welatê me salê çend insan di qezên trafikê de can didin. Em bêjin Bavê Nazê di kewarê de dijî.

Di 1987'an de munaqêşa van tiştan kirin dilê min dide şewitandin

Lê gelo redaksiyona Armançê li kuderê dijî?

(1) Yanî tebiît?

**Çirok...**

in? Eger hûn were jêhatî ne herin mîrê min û hevalên wî bigrin. Tirsonekno, ciyê ku ew bi şev diçinê hûn newêrin bi roj hernê. Îcar hûn tîn heyfa wan ji me jin, pîr û zarokan hiltînin û çav bera namûsa me didin. Eve ha dê ji we re nemîne!

Lê çawiş tu paxav li peyvên wê nekir. Carek fikra xwe li wê xera kiribû... Dîsa bi bişrandina berê çavên xwe lê zoq kir û ber pê de çû...

Lê Sosinê yek nekir du; weke ber bi hewa de bîfire, her dû milên xwe li pêşiya xwe rast kir û xwe bi gelî de berda. Qerînek tûj û bi şewat jê çû. Dengê wê mîna qêrîna qulingên ku vedigerin germiyana li nav lat û zinaran olan da; bû du deng, bû sê deng, bû çar deng û belav bû... Sosinê can da lê namûsa xwe neda.

**HEVKARIYA CIVAKA ERMENIYA...**

şes meriv bûn. Sala xelayê bû gundê Bêriyê hatibû wêrankirinê, deşt û bostan bûbûn xopan û bêxwedî bûn. Me nanê gilgilî paşin kiribû nolanî poxî nê dixwar. Birê min ê biçûk û xuşka min digîriyan, diya min ji hal ketibû, bûbû hestû, ebûra me vedibû, Tirkê cî jî bê xwarin bûn, gelek meriv ji birçîna miribûn û hema di kuşa de ketibûn. Em jî nêzikî wî halî bûbûn. Tirkekî ji gundê me Arif Efendî, li hespê xwe siwar bûbû wê biçûna ber bi gundê Xiranê, min ji wî rica kir, ku min jî bi xwe re bibe belki ez herim cem destê me yê Kurd hinek erûk-bêrûk bînin, ev nabêje na. Ez didim pey hespê wî, em jî Bêriyê bi dîr dikevin û digîrijin gundê Xaşinê, ji vir em bi lez dertên, di gelîkî de li ber kaniyekê disekin, ew nanê ceh derdixê, em dixwin. Êdî qewet di min de heye, dilezînim. Bi vî awayî, jî dîr ve gundê Kurda yê Plan ku nêzikî Dêrsimê bû tê xuyakirin. Kirivê me yê Memo dikeve bîra min. Ew merivekî dil bi rehîm bû, ruyê wî jî hebû. Xwezîka sax bûya û li gund bûya min got jî xwe re. Ewtîna kûçîka bû, em êdî qeraxê gund bûn. Ez nêzikî malekê dibim, bi zimanê xwe yê Kurdiya şikeştî ji kulfeta ku li ber derîbû dipirsim:

—Mala Memo kîjan e?

Ew min dibe avaya rex mala wan û em bi pêpelûkên gevir re hildixşin jorê. Ew kulfeta dike gazî, wê deqê kulfetek û qîzek jî mal dertên. Ez di derheq kirivê me yê Memo de dipirsim, lê ew jî ji min pirs dikin çika ez kî me. Ez ji wan re dibêjim ke ez kurê Sarkîs im. Wê kulfete, piştî vî yekê tevhev dibê û bilez diçe hundur, ez cexla derî re demê kirivê me yê Memo yê rehîm û ruyê wî yê dirêj dibînim.

Bi lez, min dibin malê, Memo, kulfeta wî û qîza wî li dor min dicivin. Em halê hevûdu dipirsim, êdî naxwazim di derheq girîn, axîn û ofîna wan de, ku çewa kulfeta Memo li çokên xwe dixist, bi gilîkî wextê di derheq me de bihistin, gelekî li

ber xwe ketin. Li min dereng bû, divê biçûma gundê Moxindiyê jî li wir jî kirivêki me hebû, navê wî Miko bû. Rojîra dinê, bi şeveqê re, tevî zavê Memo em diçin ber bi gundê Moxindiyê de. Ez wî kalî dibînim, ew min hembêz dike, eniya min radimûse û digirî... Di-beje; lawê Sergîs e, lawê birê min e, ji min di derheq mala me de dipirse. Biçûk û mezinên merivên wan li mala Miko dicivin, bi halê me dihesin, hêrs dibin, li ber xwe dikevin. Niyeta min heye qene seetekê zûtir vegerim Bêriyê, xuşk û birayên min tî, birçî çavê wan li hêviya min e, ku ev du roj in min ew hiştine.

Ez soz didim, ku ezê dîsa ve gerim cem wan, îzna xwe ji wan dixwazim, û ber bi gundê Planê bi re dikevim. Ji bo ewlekarî merivekî dixin rex min. Lê pêşiya me sê kerên bi çewala ve barkirî diçin. Helbet ez nizanîm çî di çewalan de heye. Her zanîm ku kirivê me yê Miko yê Kurd jî me re dagirtine. Nîvro êdî em li ber deriyê kirivê me yê Memo bûm. Ez naxwazim hilkişim jor, qene seetekê zûtir bihîjim malê. Ew merivên dilrehm, niyeta dilê min fam dikir. Kirivê me yê Memo jî wek alîkarî du keran bardike. Nîvro bi du Kurdê çekdar ve em bi rê dikevin. Dilê min ji şabûna dukete. Deh çewal xwarîna me heye, bivê nevdî wan çewalan de ar(van), genim yan jî ceh heye. Dibe ku tîra me ya salekê bike. Belê, ew ji min re hebûna dinê bû... (42)

Xudanekî Ermeniya yê din awiha bi heqî dinivîse: "Tu cara wê qedirgirtina, hurmeta ku Kurdên Dêrsimê yên qizilbaş ber bi Ermeniyên zênantî nişan danê, nayê jibîrkirin. Wan bi mehan û salan, bi hezaran Ermeniyên mihaçir di nav xwe de xwedîkirin... (43)


Wiha, bi vî awayî di her qezakê de peywendiyên Ermeniya û Kurdan ên sosyal-ekonomîkî mecal dida sazîkirin ji bo dostaniya wan her û her tekûztir bibe; ya ku bû hîme şerkariya wan a pêkve le hemberî her zênandarekî û zefkarekî.

Dom dîke

**Pesîmîstirînên Dinyayê: TIRK****•Li Tirkîyê ji her deh kesan çar kes rojên hîn xerabtir dipên.**

Li 18 welatên Ewropayê li ser hêvî û payînên merivan ji sala 1987'an û ji rojên pêş îstatîstîkê hat çêkirin. Îstatîsk, li her welatî di navbera 1000 kesî de hatiye çêkirin û ji wan hatiye pirsîn ku ji sala bê bi şexsî hûn çî dipên, hêviyên we yê çî ne? Di nav 18 welatan de yên herî pesimîst, ji deha çar kes, (%38) Tirk bûne. Ji deha çar kesên wan gotine ku em rojên hîn xerabtir dipên, sala 1987'an wê ji sala 1986'an xerabtir bibe.

Li gel vî pesimîstiya Tirkan jî sedî %57'ê îtaliya ji sala bê bêtir bi hevî bûne, gotine ku sala 1987'an wê ji sala borî baştir be. Di nav 18 welatên Ewropa de Swêdî di rêza duduya de cî digirin. Û "Tirkîya" Ewren jî cardin wek gelek caran ji dawiyê bû yekem...

**Ressamekî Kurd: XAZÎZADE**

Di hejmara bê de

**KONGRA DUDUYA YA ENSTÛTUYA KURDÎ YA FRANSA CIVIYA**

□Helbestvan û nivîskarê hêja Hejar Mukriyanî û Kurdzana Fransî Joyce Blau jî di kongrê de beşdar bûn.

□Sosyolog Dr. Îsmail Beşikçi bi dengên hemû beşdarên Kongrê wek endamê Kongrê yê payeberzî hat hilbijartin

Kongra Duduya ya Enstîtuya Kurdî ya Fransa li Paris di 13 û 14'ê meha Çilê Pêşî di civiya. Ji 140 endamên Enstîtuyê 44'ê wan beşdarî Kongrê bûbûn. Serokê Enstîtuyê Kendal Nezan rapora xebatê û Josê Bertolîna rapora malî xwend.

Roja duduyan, komîtên karûbarên Enstîtuyê, di nav xwe de civiyên û raporên xebatên xwe pêşkêşî kongrê kirin. Ev, komîtên Ziman û Edebiyatê, Îlmê Însani Huquq û Civak, Weşan û Çapxane, Muzîk û Huner bûn. Her wiha her komîtê, li ser navê xwe kesek pêşkêşî kongrê kir, ji bo ku tekevin Heyeta Îdarî ya Enstîtuyê.

Di xelasbûna Kongrê de helbestvan û nivîskarê hêja mamoste Hejar Mukriyanî axaftina dawiyê kir. Kurdzana Fransî Joyce Blau jî di kongrê de beşdar bûbû û roja pêşîn kongre îdare kir. Dr. Îsmail Beşikçi bi dengên tevayî yên beşdarên Kongrê wek endamê payeberz ê Enstîtuyê hat hilbijartin.

Di kongrê de biryar hat stendin ku ji niha pê ve "Hêvî" li Stockholmê bê derxistin.

Berpirsyarên Enstîtuyê di kongrê de nerazîbûna xwe ji Enstîtuya Kurdî ya Bonê dan xuyakirin. Li ser vî yekê Kongrê biryar girt ku ger heta Gulana 1987'a daxwazên Enstîtuyê Kurdî ya Fransa ji bal Enstîtuya Bonê ve neyên qebûlîkirin, divê bi her awayî tîkilî jê bînin.

**Dî Meclîsa Ewren de Bergîran da Tîzikan**

□Herçî çî kar û barê meclîsa Tirkîyê hebin jî tev li ser pîştî General Ewren û Serokwezîr Ozal in. Ew tu carî rê nadin ku meclîs qanûn û biryaran derxîne, ew bi xwe him welat îdare dikin him qanûnên jî xwe re lazim derdixînin. Loma jî tu kar jî meclîsê re namîne. Parlementer jî betalî û munaqêşên bê netîce, gelek caran destpêdîkin tîzîka davên hev, şer dikin, serê hev dişînin. A ji we re nimûna peyvên civînek meclîsê:

—“Tu mikrobê vedirşî”  
—“Tu derewa dikî”  
—“Bê terbiye...”  
—“Meqîre, parlementerê xwefiroş”  
—“Bavê te xwe firotîye...”  
—“Heger tu mîrî peya be jê”  
•Aydin Arvasî (ANAP) “Tu bê şerefî.”  
•Yılmaz Demir (SHP) “meqîre xwefiroş.”  
•Ozgur Barutçu (ANAP) “Heger tu mîrî peya jê. Xwefiroş bavê te ye.”  
•Îsmail Ugdul (ANAP) ji parlementera serbixwe Turkan Xanimê re: “Ehmaqê, qahpîka heram, ezê rê te bidim.”

Piştî van xeberên jorin gurûbek parlementerên ANAP'ê êrişî ser Yılmaz Demîr (SHP) kirin. Şerekî mezin derket û di şer de gelek kes birîndar bûn, ji hev xwîn herikandin.

**Weşanên Nuh****KURDER**

•Navê pirtûkê “Kurder i Mellersta Östern och i exilen” (Li Rojhelata Navîn û surgûnê Kurd) e. Pirtûk bi Swêdî ye û ji alî Elin Clason ve hatiye nivîsandin. Pirtûk bi kurtî qala coxrafya, ziman, nufûs, netew û rewşa berê û îroyin a li her perçê Kurdistanê dike. Pirtûk 36 rûpel û 25 Skr. ye. Pirtûk ji alî Daîra Biyaniyan ve li Norrköpingê hatiye çapkirin. Navnîşana destxistina pirtûkê ev e:

Statens Invandrarverk  
Box 6113  
600 06 Norrköping/Sweden

**SIYAMEND Û XECÊ**

•Ev pirtûka “Siyamend û Xecê” li Kurdistanê Sûriyê wergerandine Erebbî. Pirtûk bi navê “Xwelî li te be dara behîvê” hatiye çapkirin.

**PÊDARÎ**

•“Pêdarî” navê dîwanek helbesta ye ku ji aliyê Dilawerê Zengî ve hatiye afirandin. Ev pirtûk li Kurdistanê Sûriyê hatiye çapkirin.

**ZEMBÎLFIROŞ**

•Destana “Zembîlfiroş” ji alî Dr. Mihemed Ebdî Necarî ve zimanê Kurdî hatiye wergerandin. Pirtûk bi Erebbî li Kurdistanê Sûriyê hatiye çapkirin.

**HATIRATIM (BÎRANÎNÊN MIN)**

•Ev pirtûk ji aliyê Veterîner Dr. M. Nûrî Dêrsimê ve hatiye nivîsîn. Ew qala jîyan û tekoşîna xwe dike. Pirtûk di nav weşanên Roja Nû de derket. Ev pirtûk cara yekemîne ku tê weşandin, lê zimanê wê hinekî giran e. Ji ber ku bi Tirkîya kevn hatiye nivîsandin. Pirtûk 224 rûpel e û heqê wê 40 Skr. ye. Navnîşana destxistina pirtûkê ev e:

Weşanên Roja Nû  
Döbelsgatan 16 B  
113 58 Stockholm/Sweden

# Hunermendek Kurd Şuayip ADLIG;

“• Berpirsyariyek min li hember gelê min heye.. • Her roj min bîhna polîs û leşkeran di çema stuyê xwe de hiskir.”

**Pirs:** *Wek tê zanîn xebata te ya hunermendî pîralî ye; sîne-ma, tiyatroyê û h.w.d. Lê mereqa te ya fotokîşandinê çawa destpêkir.*

**Bersiv:** Xebata min a foto ne ji ber meraqê destpêkir, ji ber bê mecalî bû. Gava ez ji hefsê derketim (1980), tiştê min tune bû. Polîsên Tirk dest dabûn ser hemû aletên min ên sînemayê. Qeweta min tunebû ez dîsa wan aletê xwe bikirim. Û ez ji valabûnê hiznakim û berpirsyariyek min li hember gelê min heye. Îmkanên min dest didan ji bo fotokîşandinê. Ji ber vê yekê min dest bi xebata fotokîşandinê kir. Lê di nav xebata fotokîşandinê de meraqa min jî çêbû û her çîşê diçe ev meraqa min zêde dibe.

**Pirs:** *Te fotoyên xwe çî çax û ji kîjan deverê topkir.*

**Bersiv:** Min van fotoyên xwe di navbera 1980-84 de ji devera Batman, Farqîn, Hezo (Kozluk), Cizîr, Qapilcews (Soson), Şirnaq, Erüh, Ruha (Urfa), Uludere, Midyat, Kercews (Gercüş), Hesênkeyfê kişand.

**Pirs:** *Tu di foto de li kîjan mijarî digeri?*

**Bersiv:** Ez di foto de bi giranî jiyana rojane digirim. Ez dixwazim birçîtîya insanê xwe, bêçarebûna wan, derdê wan, ûrf û adetê, ahlâq û tîbetîta wan derxim berçav. Bi vî rengî dixwazim ferqiyeta miletê û welatê xwe bidim nîşandan.

**Pirs:** *Di vê xebatê de çî dijwari derketin pêşiya te?*

**Bersiv:** Di vê xebatê de sê dijwariyên mezin derketin pêşiya min:


1. Tadeyîya û pêşigirtina dijmin;
  2. Nezaniya xelkê me;
  3. Rewşa aborî.
- Gava min dest bi vê xebatê

kir ji roja pêşîn heta roja dawîn, heroj min bîhna polîs û leşkeran di çema stuyê xwe de hiskir. Bi sedan mîsal hene, lê ji vana ezê qala yekê bikim. Rojekê li taxek Êlehê (Batman); Kaxîka digeriya. Ev tax di Êlhê de, taxa harî feqîr û paşdemayî ye. Lexem li kuçaya diherike. Di germa havînê de vîze viz ji her derê taxê tê. Ez ketim kuçekê min dît ku sê keçik li ber siya xanî sênîkî mezin di navbera wan de ye, şîra dibirin. Zarokê pêxwas û he-ta navê tazî, li ser çavê wî komik mîş danî, li cem wan e. Min dest avêt makîne; nêzikî wan bûm, bi çend şekla sûretê wan kişand. Wê gavê taxsiya polîs li ber min sekinî û min avêtin erêbê birin qereqolê. Ji min pirsin; “Tu kî yî?”, “Çima sûretê wan dikşîn?”, “Tu di petrolê de karkerî, çima vî karê han dikî?”, “Tu ji kê re xizmetê dikî?”, “Tu çima fotoyê van taxên han dikşînî û çima yê sîteyê (taxa dewlemend û burokrata) nakşînî?” û h.w.d. Li çente û li ser min geriyar ji xeynî fotoyan tiştê nedîtî. Di dawiyê de bi tehdît û çêra min verêkirin.



Li Batmanê taxa Koxîka çend keçik di bin siya diwar de şehîra dibirin. Foto: Ş. Adlig

□ Şuayip Adlig hunermendekî Kurd e, li Fransa dimîne. Entreseya wî ya henermendî di sala 1974'a de bi naskirina Yilmaz Güney destpêkir. Ew bû hizkiryê sînemayê, di gelek filmên Yilmaz Güney de xebitî, di filmên Endîşe û Sürû (Kerî) de rol stend. Di filmê Yol (Rê) de rolek girîng danê lê ji ber qedexekirina Urffî îdarê wî wê rola xwe nelîst. Di dawîya 1977'a de ket nav xebata DDKD ê. Ji ber vê xebatê sala 1979'a hat girtin. Çar meh di hepsê de ma.



Sala 1984'a ji ber ku lêdigeriyar derket derveyî welat. Di dawa DDKD ya teyavî de 10 sal heps û piştî wî jî 2 sal û 8 meh surgûn danê û ji hemû karên resmî hate qedexekirin. Nuha jî li Fransayê multeciye siyasî ye. Û di grubek profesyonel a tiyatroyê de wek aktor dixebite û karên xwe yê di derheq fotoxraf û sînemayê de didomîne. Em pê re rûnîştin, me di derheq karê wî yê fotografi de pirs jê kir, wî jî bersiv da.

Dijwariyek din jî, wekî min li jor qalkir, nezaniya gelê me bû. Nemaze dema min fotoyê jina dikşand, rûyê xwe tîş dikirin, carna çêrî min dikirin, carna didan dî min, çend car ez ji mirinê xelas bûm. Ez karim bi rehetî bêjim, qet tu jinekê bi dilrehetî nehiştîye ez sûretê wê an wan bikşînim. Bi hezeran bîranînên min hene,

dixwazim yekê ji vana bejim: Ez rojekê zû rabûm ji bo sûretê pîrek û zarokên bi romoqê (traktor) diçin pembû çîninê bikşînim. Min nêzikayî li romoqê kir, nêzikî 50-60 keç û jin lê siwar bûbûn. Dema min sûretê wan kişand, wan ez dîtîm û qêrin bi wan ket. Bi hezeran çêr li min bariyan. Dengê yekê, ji dengê gişan bilintir bû. Min di wê heyecanê de bes gotinê wê fêhm kir. Di got; “kurê kerê tu çî dikî? Çima tu sûretê diya xwe nakşînî?”

Ez berbâyî wan neketim, min fotoyên xwe kişand. Piştî min fotoyên xwe kişand, min deng li wan kir; “Xuşkê mino! Qet meraq nekin, min ne tenê sûretê diya xwe, her wisa min sûretê pîreka xwe û yê xwişkên xwe jî kişandîye, hûn mabûn, min sûretê we jî kişand. De bi xatîre we, hûn çî dibên, bêjin”. Piştî 20 rojan, li jêra Êlehê (Batman), nêzî alaya komando, eynî romoq tevî ew kesên min sûretê wan kişandibû, bi rabûna lehiyê romoq qelibî,

18-20 kes mirin. Piştî vê bûyerê, rojnamevana bihistin ku min berê sûretê wan kişandîye bi dû min ketin ji bo sûret bi dest xin. Ew sûretê ku min kişandibû, min da Ajansa Anadoluyê.

Eger rewşa min a aborî başbûna, min karibû xizmetek hin çêtir bikira. Ev jî ji bo min dijwariyek bû.

**Pirs:** *Vê xebata te çî fêkî da?*

**Bersiv:** Dema ez li welat bûm, min li Batmanê du raxistin vekirin. Navê raxistina “Yöremden Raslantılar I-

Amator ya Sîne-ma û Foto ya İstebol) û 2 heb di raxistina foto ya navnetewî ya Sofyayê, sala 1983.

Piştî ez hatim Fransa, li sala 1985'a de, li çar bajarên Fransayê pênc raxistin vekir, (Val de Reuil, Dieptducit, Ponde Meir, Evreux). Min van sûretên ku raxist, wekî albûm di nav weşanên Jîna Nû de çapkir.

**Pirs:** *Di hêla fotokîşandinê de ji bo rojên pêş çî difikirî?*

**Bersiv:** Nuha di destên min de qandî 350 sûret hene. Ez dixwazim vana jî raxînim û di pêşda rewş îmkân bide, ezê herim welat hin tiştên ez difikirim, pêkbînim.



Romoqa jin û keçên kurker dibe ser pembû. Ev romoq tevî van kesên li serê, piştî kişandinê fotoxraf 20 roj şûnde wê biqelibe: 18-20 kes wê birin. Foto: Ş. Adlig

1982; Yöremden Raslantılar II-1983—84”. Di van her du raxistina de her carê 60-70 sûret hebûn. Min dil kir ku ez li Diyarbekir, li Halk Kültür Merkezi (Merkeza Kulturîya Gel) û li Anqerê, li Kizilay Sanat Evi (Mala Sinet ya Heyvasor) jî van raxistinên vekim, lê Urffî îdarê rê neda min.

6 sûretên min laîqî raxistinên navnetewî hat dîtî; 4 heb di raxistina İFSAK (Kluba

## Armançê Bixwîne • Bide Xwendin

# GURPIÇÛKÊN MEKSÎKÎ

□ Gabrielê 10 salî: “Ezê wer dewlemend bibim ku ez karibim pere bidim dokorekî da bê me derman bike”

Rojek ji rojan havîna 1985'a, du zarokên Meksîkî di hidûdê Dewletên Amerîka Yekbûyî (DAY) de, hatin sekinandin. Her çîşê du doktorên Meksîkî bi wan re bûn û diçûn nexweşxanek unîversîtê jî, lê cardin destûra ketina wana hundur nehat dayîn.

Dergevanên gumrika Amerîkî, gava dîtibûn ku her du zarok ji dest û ser çava bigre heta hemû laşê wan bi pirç e, texmîn kiribûn ku her du jî bi nexweşiyek xeter û dirmî ketine.

Mesele gîhaşt wê derecê ku, masmedîa (çapemenî) pêrgiyî gurpiçûkên Loretoyî hat, hay ji wan bû. Her tişt sala 1905'a, gava Maria Luisa Diaz zarokê xwe yê ewil anî dinê, destpêkir. Zarok bi hemû laşê xwe ve bi pirç bû.



Gabriel û Jesus bi xuşka Gabriel, Dulce re ku bi her awayî tabî ye, bê pirça gurpiçûkan e



Juana Gomez bi kurê xwe Gabriel û hevalê wî Jesus Aceves re. Gabriel û Jesus du kes in ji wan 21 zarokên ku li gundê Meksîka, Loreto tevî pirça ruyê xwe hatine dinê.

Ji wê rojê bi vir de 21 gurpiçûk hatin dinê: 14 ji wan lawik û 7 jî keçik. Tev jî ji nesla Maria Diazê bûn.

Her du piçûkên ku di gumrika Amerîkî de hatin sekinan din; yek jê Gabriel Gomezê 10 salî û yê din jî Jesus Acevesê 12 salî bû. Xuşk û birakî Gabriel heye. Birê piçûk Victor jî, wek, Gabriel bi pirç e. Lê xuşka wan Dulce, wek hemû keçikan, bi her awayê xwe, keçîkek tabî ye.

Ji musabaka Futbolê ya

Şampiyonîya Cihanî ya Meksîko bi vir de xwen û xeyalek Gabriel heye. Dibê:

—Ez dixwazim bibim lîstikvanê futbolê. Dixwazim bibim merivekî bi navûdeng,

pera qezenc bikim û bi wan pera ezê hewl bidim dokorekî bivînim, ku karibe me tedawî bike...

Di rastiyê de her çîşê pirçgurbûna gurpiçûkên bêxeter e jî lê ew jî ber xuyakirina şêla xwe gelekî dikşînin. Gelek kes dibê qey nexweşiyek dirmî (a ku ji yekî derbasî yê din dibe) ye, bi bawerîya hinan jî pirç cezakirinek xwedê ye.

Lê doktor Antonio Maciasê Meksîkî yê

xeyal bikin ka wê kengî dermanê derdê wan bê dîtî.



Dr. Antonio Macias ji gelek sal berê de xwe daye lêkolîna ser sedemên çêbûna zarokên gurpiçûk

ku ji mêj ve ye li ser rewşa gurpiçûkan lêkolîn dike, dibêje ku:

—Rastî ew e ku, ev xweşaşkirinek genetîkî ye ku her carê xwe serdest dixê. Loma jî wê gelek zarokên wiha, car bi car werin dinê.

Hê doktor Macias bi ser ve nebûye ku sedemê wê pirçgurbûna zêde çî ye.

—Ger min zanîbûya, niha ez li ser dîtîna dermanê wê jî bûm, dibê doktor Macias.

Lê di nav îş de mesela irsiyetê heye û meriv nikare bizanibe ka gelo zarok bi pirç yan bê pirç were dinê.

Gelek ailê hene ku hin zarokên wan bi gurpiçûkî hatine dinê di eynî wexta ku zarokên din qet ne wiha ne.

Heta ku rojekê yek pêrgiyî sedemê wê xetayê bê, gurpiçûk mecbûr in ku bi şîka dewamî ya mirovên din re bijîn û